

DOH Û ÎRO REWŞA EDEBIYATA KURDÎ

Klasikên kurdî yên nivîskî di navbera sedsalên 10 û 19'an de mane. Piranî û giraniya berhemên edebî ji aliyê meleyên kurd ve, di medreseyan de hatine nivîsandin.

Rûpel 11

ŞEMALA HÎVÊ BI PÊLÊN ÇEM RE DIKIŞIYA

Biharek ji biharên gundên me ye. Hêşînahî,, rûyê erdê girtiye. Avê kaniyan di quntarên çîyan de diherikin, çîrav bi çîrav digihîjin hevdu. Bêhna gul û gulçînan, dengê teyr û tûyan bi avê re berê xwe dide deştê.

Rûpel 10

EHMEDÊ XANÎ Û MEM Û ZÎN

Ev pirtûk, bi rastî ne bi tenê li ser Mem û Zînê ye. Li ser rewşa miletê kurd e. Ew li ser hebûn û yekbûna gelê kurd hatiye nivîsandin. Wê demê wiha bû.

Rûpel 7

Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL:1 HEJMAR:3

4 BERFANBAR 1994

BUHA:25.000 TL(KDVD)



Çar alî tev bû zivistan/ Çar alî şanzdeh bager/ Û heft demsal/ pênc qite/ Di binê berfê de ye/ Toros/ hember toros/ û Firata asî/ Titûn/ pembû/ deştên genim û çêltûkê/ Welatê min seranser/ Di binê berfê de ye.

MEBÛSÊ BERÊ YÊ PARTIYA KARKERÊN TIRKIYÊ (TIP) RONAKBÎRÊ KURD Û HEVALÊ MEDET SERHAT, TARIK ZIYA EKINCI LI SER KUŞTINA KURDAN JI ME RE PEYIVÎ:

LI TIRKIYÊ DEWLET EŞÎRET E!

● Cinayetên "failê wan meçhûl" in, êdî belî bûye ku bi hin wesîteya teşkilatan ve tînin kirin. Ev teşkilat di nava dewletê de û di bin hîmaya wê de ne.

● Di zemanê Demirel de cinayet pir bûn û wî îzin daye van tiştan. Yanî Demirel îşareta şîn (kesk) vêxistiye. Emrê cinayetên Demirel daye.

Rûpel 8-9



Di cengê de psikolojî

Di tîkîlî û danûstandinên çandî, zanistî, siyasî û akademîk de

Enstîtuya Kurdî gaveke dîrokî avêt

● Di navbera Enstîtuya Kurdî û Enstîtuya Rojhelataniyê de li Moskovê peymaneke hevkarîyê hate îmzekirin. Peyman di 28'ê Sermawezê de, li Moskovê pêk hat.

● Li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Berlînê Prof. İsmet Şerif Wanlî û li ser navê Enstîtuya Rojhelataniyê ya Moskovê jî Prof. R. Ribakov îmze avêtin binê Peymana Hevkarîyê.



Rûpel 2

DI TÊKILÎ Û DANÛSTANDINÊN ÇANDÎ, ZANISTÎ, SIYASÎ Û AKADEMÎK DE

ENSTÎTUYA KURDÎ GAVEKE DÎROKÎ AVÊT

JÎ ROJÊVE

KURD Û SAZIYÊN NETEWYÎ


Enstîtu, akademî, unîversîte, dibistan û her cure saziyên kurdî ji bo zehfê kurdan hê jî wekî hedefên xeyalî ne û pir dûr tîn dîtin.

Nexasim dema ev sazî, neteweya kurd giş eleqedar bikin, hingê ev hedef hîn dijiwartir û biastengtir tîn nirxandin. Şertên jiyane yên xerab, giyana bindestiyê û her tim jiyana ji hemû mafên neteweyî bêpar vê fikra bedbîn (pesimîst) çêdike di mejiyê kurdan de.

Halbukî ku bi baldarî li pêşveçûn û berhemên têkoşinê bê nêrtin, wê bê dîtin ku kurd êdî tenê ne li serê çiyân û zinaran, herwiha li bajar û salonan, di civîn û konferansan, di pêşbazî û lêkolînan de jî hêdî hêdî xwe nîşan didin. Di warê dîplomasi, siyasî û zanistiyê de nûnerên gelê kurd êdî bala hemû dinyayê dikişînin ser xwe û bêmafûna gelê tirk.

Hîn di destpêkê de be jî, saziyên kurdan faaliyetên xwe yên neteweyî zêde dikin. Di vî warî de gaveke pir muhîm Enstîtuya Kurdî ya Berlînê avêt. Ev gav ji bo kurdan bêguman hêjahî nirxandinên dirêj e.

INSTITUYA KURDÎ
Ji bo Lêkolîn û Zanîstî



1994

СОГЛАШЕНИЕ О СОТРУДНИЧЕСТВЕ
Между Институтом Востоковедения РАН и Курдским научно-исследовательским институтом в Берлине

Институт Востоковедения Российской Академии наук, Москва (в дальнейшем: Российский Институт Востоковедения) и Курдский научно-исследовательский институт, Берлин (в дальнейшем: Курдский Институт), провели совместный симпозиум на тему: "Современное состояние курдской проблемы" 24-25 ноября 1994 г. в Москве. Выразив готовность к осуществлению сотрудничества в области курдоведения, согласились о нижеследующем:

1. Обмениваться всеми публикациями и периодическими изданиями, относящимися к курдоведению (в области языка, литературы, фольклора, истории, этнографии, социальной, экономической и политической ситуации в Курдистане);
2. Российский Институт Востоковедения будет принимать курдских аспирантов по представлению Курдского Института и за счет Курдского Института;
3. Оба института будут приглашать профессоров или исследователей на конференции или симпозиумы, организуемые на темы о курдах и Курдистане в странах Западной Европы. Курдский институт со своей стороны берет на себя затраты по пребыванию русских ученых на время симпозиумов и конференций;
4. Оба Института будут обеспечивать свои библиотеки источниками и документами о курдах и Курдистане, которыми они располагают;
5. Оба Института будут организовывать совместные симпозиумы и конференции по курдоведению;
6. Дирекция обоих Институтов будут встречаться один раз в год попеременно в России и Западной Европе для рассмотрения вопросов, связанных с развитием курдоведения в России, Западной Европе, Курдистане и других странах;
7. Настоящее Соглашение действительно сроком на три года. Оно продлевается автоматически на следующие три года, если не денонсируется одним из Институтов за шесть месяцев до истечения срока его действия;
8. Настоящее Соглашение имеет целью развитие курдоведения и курдских исследований. Оно не направлено против какой-либо третьей стороны;
9. Договаривающиеся Институты создают совместный Комитет в составе двух представителей от Российского Института Востоковедения и двух представителей от Курдского Института для реализации настоящего Соглашения и поддержания постоянных связей;
10. Настоящее Соглашение подписано в г. Москве 28 ноября 1994 г. и выполнено на двух языках: курдском и русском. причём оба текста имеют одинаковую юридическую силу.


Институт Востоковедения РАН, Москва - Профессор Р. Рибакое, директор

Курдский научно-исследовательский институт, Берлин - Профессор Ванли Исмет Шериф, директор

Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, di 24-25'ê Sermawezê de li ser dawetiya Enstîtuya Rojhilat-zaniyê ya Moskovê, çûbû Rûsyayê. Di heyeta Enstîtuya Kurdî ya Berlînê de Prof. Dr. Îsmet Şerîf Wanlî, Doç. Dr. Cebbar Qadir û nivîskar Dilbixwîn hebûn. Di îmzekirina peymanê de, ji Rûsyayê Prof. Hasretyan, Prof. Lazarêf û Dr. Êgarîn beşdar bûn. Peyman bi du zimanan, rûsî û kurdî hate amadekirin û îmzekirin. Bendên (madeyên) vê peymanê li jêr in:

1- Hemû weşanên di warê kurdzaniyê de (ziman, wêje, dîrok, etnografya, sosyolojî, rewşa Kurdistanê ya aborî û siyasî) wê bi hev bêne guhertin.

2- Enstîtuya Rojhelat-zaniyê ya Moskovê bi rîya Enstîtuya Kurdî wê aspirantên Kurd bi-pejirîne, ew aspirant li ser hesabê Enstîtuya Kurdî dixwînin.



Li ser navê Enstîtuya Kurdî Prof. Îsmet Şerîf Wanlî, Peymana Hevkariyê ya ku li jor tê dîtin, bi Nûnerê Enstîtuya Rojhilat-zaniyê ya Moskovê Prof. R. Ribakov re îmze kir.

3- Herdu enstîtu ji bo beşdarbûna konferans û sempozyomên zanistî yên li ser kurd û Kurdistanê, profesor û lêkolînanên hev wexwendî (dawet) dikin.

4- herdu enstîtu pirtûkxaneyên hev bi çavkanî û dokumentên der barê kurd û Kurdistanê de yên ku li cem wan peyda dibin, dewlemed dikin.

5- Herdu enstîtu

sempozyom û konferansên li ser kurdzaniyê bi hev re (hevbeş) li dardixin.

6- Serokatiyên herdu enstîtuyan salê carekê an li Rûsyayê an jî li Ewrûpaya Rojava rastî hev tîn û li ser pêşvebirina kurdzaniyê li Rûsyayê, Ewrûpaya Rojava, Kurdistanê û li welatên din radiwestin.

7- Ev protokol ji bo sê salan e. Piştî sê sa-

lan yekser ji bo sê salên din, eger ji herdu aliyên aliyek şeş mehê berî temambûna sê salan nexwaze wê bide sekinandin, tê dirêjkirin.

8- Armanca vê protokolê pêşvebirina kurdzanî û lêkolînanê kurdî ye.

9- Herdu enstîtu yên ku ev protokol îmze kirine, komîteyêke hevbeş ji çar kesan saz dîke. Du kes ji Enstîtu-

ya Rojhelat-zaniyê, du kes jî ji Enstîtuya Kurdî ne.

10- Ev protokol, bi du zimanan, rûsî û kurdî, li bajarê Moskovê roja 28'ê Sermawezê sala 1994'an hatî ye nivîsandin û îmze kirin. Giraniya herdu nivîsan jî, ji aliyê qanûnî ve yek e.

Moskov
Welatê Me



Wezîrê Tirk îstifa kir

Wezîrê Karê Derveyî yê Tirkiyeyê Mümtaz Soysal di 28'ê Sermawezê de îstifa kir. Îstifaya Soysal, tê gotin ku bi dilê Tansu Çiller e. Li gorî agahiyan nerazîbûna Soysal, li hemberî niyeta hikûmetê ya ji bo "Pakêta Demokratîkbûnê" û dirêjkirina Hêza Çakûç bû. Îstifaya Soysal, di nav şirikê hikûmetê SHP'ê de bû sebebê nexweşiyên.

Mudeta Hêza Çakûç dirêj dibe

Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK), di 30'ê Sermawezê de civiya û biryara dirêjkirinê, tawsiyeyî li jneya (heyeta) wezîran kir. Civîna MGK'ê di bin serokatiya reîsîcumhur Süleyman Demirel de, bi beşdariya serokwezîr Tansu Çiller, alîkarê wê Murat Karayalçın, serleşker İsmail Hakkı Karadağî û wezîrê din, çebû.

Cîndorûk çû İspanyayê

Serokê Meclîsa Tirkiyeyê Hüsamettin Cindoruk, ji bo ziyareteke resmî di 27'ê Sermawezê de çû İspanyayê. Ziyareta Cindoruk, li ser daweta Serokê Konseya Ewropayê yê Asambla Parlementeran Miguele Martinez, çebû. Cindoruk ziyareta xwe, bi giranî ji bo modela Baskê, ençama vê modelê û fikrên mebûsên Baskî, dike.

Rojnameyê nû: Realite Press

Li Stenbolê, di 30'ê Sermawezê de rojnameyek bi navê Realite Press, derket. Rojname, 4 rûpel kurdî yê din bi tirkî, tev 16 rûpel e. Xwediyê rojnameya Realite Pressê Orhan Kotan e. Kordînatör Emin Karaca, Berpirsiyarê Nivîsaran jî Mahfuz Sürgit e. Orhan Kotan, di sala 1986'an de li Swêd rojnameya Kurdistan Press derxistibû.

Gundên Çiller

Serokwezîr Tansu Çiller bi projeyeke nû, (Projeya Gundên Merkezî), gundan dicivîne ser hev. Li Kurdistanê 2000 gundên şewitî û valakirî, wê di çarçoveya vê projeyê de bibin gundên merkezî. Ev plan di zemanê reîsîcumhurê berê Turgut Özal de, ji bo li hemberî şerê gerîla, alîkirina xelkê kêm bike, hatibû plankirin.

Mîna gelek nivîskar û rojnamevanan Ahmet Zeki Okçuoğlu, Hikmet Çetin û Ömer Ağın jî, ji ber fikrên xwe radizên.

Li zindana Gemlikê sê ronakbîrên kurd

Di nav kurdan de peyvek heye ku ji aliyê her kesî ve pir baş tê zanîn: **Heps. Peyva hepsê, berê zindan bû. Lê peyva girtîgehê ketiye şûna wan. Ji bo kurdan peyva zindanê guherî bû girtîgeh, lê ev mekana hîn jî dewam dike.**

Li Girtîgeha Gemlikê ku li ser bajarê Bursa ye, sê ronakbîrên kurd (Ahmet Zeki Okçuoğlu, Hikmet Çetin û Ömer Ağın) hene. Sûcê wan, ji ber fikrên wan in. Yanê, cudaxwazî, kurdîtiyê.

Li gorî gotina wan, dewlet di hiqûqê de li hemberî kurdan "çifte standart e", yanê di qanûnan de cudatîyekê çêdikin. Ronakbîrên kurd, li ser qanûna nû ya terore jî fikrên xwe gotin û îdîa kirin ku ev guherîn, ji makyajekê pê ve ne tiştek e.

Bi van ronakbîran re em li ser derketina Welatê Me peyivîn. Dîtinên wan ev in:

Ahmet Zeki Okçuoğlu
"Sempatiya min li hemberî weşanê kurdî heye. Kesên ku karê weşanê bi kurdî kiriye û hîn jî dikin, (Welatê Me, Armanc, Nûdem, Welat, Rojname û he-

mû weşanên kurdî) bila zanibin ku ew karekî pîroz dikin."

Hikmet Çetin
"Rojnameya Welat (1992) gava derket, sansasyonê çêkir. Derketina Welatê Me, ez bawer im, wê feydeke li xelkê me bike. Weşanên bi kurdî, ihtiyacek e. Ji bo weşanên wiha tesîrê li ser xelkê bike, lazim e herkes vî karî baş bike"

Ömer Ağın
"Derketina rojnameyê wiha, wê ji bo kultura kurdan gelek tiştan bike. Bi tenê ne ji bo kultura kurdan, lê belê wê feydeke li kultura tirkan jî bike."



Ahmet Zeki Okçuoğlu, Hikmet Çetin û Ömer Ağın her sê bi hev re di Girtîgeha Gemlikê de tene dîtin.

DIK

Nasnameya tirkî qebûl nekirin

Di daweya PKK'ê de girtiyên, nasnameya tirkî qebûl nekirin û li gorî edetên xwe danasîna xwe kirin. 46 girtiyên ku ji daweya PKK'ê tene darizandin, di 29'ê Sermawezê de li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) li hemberî paşnavên ku dewletê li wan kiriye, derketin. Girtiyên, ji dêla paşnavên tirkî, navê bavê xwe gotin. Sebebê vê yekê jî, bi edetên xwe girêdan û gotin, "Li gorî edetên me (Kurdan), insanek bi navê bavê xwe tê nasîn." Ji girtiyên M. Ali Delal, di danasîna nasnameya xwe de paşnavê xwe guherand û ji dêla Delal, navê bavê xwe Hesên, bi kar anî. Li ser vê meseleyê jî girtiyên Mehmet Acar ev got: "TC (Cumhuriyeta Tirkî)ê ev paşnav jî derî îrada me, li me kiriye. Li gorî edetê me, mirov bi navê bavên xwe tene naskirin. Em van paşnavên ku TC'ê daye me û hemwelatîya wê jî qebûl nakin. Em jî Kurdistanê ne." Di vê daweyê de 19 girtiyên, bi vî awayî danasîna xwe kirin û ev danasîn, ket nav belgeyên mehkemeyê.

**Navên
10 kesên
xelatgirti**

**Celil Akdoğan
Bağlar/Diyarbakır**

**Tamer Tanrikulu
Girtigeħa
Buca/İzmir**

**Rojhat Mutlu
Beydağı/Malatya**

**A.Vahap Turhan
Çankaya/İzmir**

**Arif Oktay
Tarsus/Mersin**

**Rehber Işık
Uludere/Şırnak**

**Salihê Kevirbiri
Adana**

**Selahattin Öncü
Mardin**

**Yılmaz Tektaş
Üsküdar**

**Dara Varlı
Ankara**

PKK, Çiller'le dalga geçti

Kürtçe yayımlanan dergide, bir helikopter fotoğrafının üstüne "PKK'nın helikopteri var" yazısı yazıldı

Helikoptera PKK'ê li Aspendosê

Li girtî ABND'ê de, PKK'ê girtî kesên li ser helikoptera PKK'ê li Aspendosê, PKK'ê girtî kesên li ser helikoptera PKK'ê li Aspendosê, PKK'ê girtî kesên li ser helikoptera PKK'ê li Aspendosê...



Derdê Milliyetê ci ye?

Ev pêkenok di hejmaraya yekemîn a rojnameya me de, di rûpela wê ya Serbixwe- Mîzahê de derketibû. Me paşî dît ku, tahamula çapemeniya tirk ji pêkenokan re jî tune, ku mijara gotinê PKK be.

Jixwe ku behs li ser helikoptera PKK'ê be hingî har dibin û

KÛRTÇE yayımlanan Welatê Me adlı dergide Başbakan Tansu Çiller'in "PKK'nın helikopteri var" sözleri alaya alındı.

Dergide üzerine PKK yazılmış bir helikopter fotoğrafı yayınlanarak "PKK savaşta kahramanlık gösteren gerillaların yılda iki defa turistik gezi için Aspendos'a gönderiliyor. Bundan sonra PKK'nın helikopteri de Aspendos'a gönderilecektir."

PKK'nın helikopteri de Aspendos'a gönderilecektir. Bundan sonra PKK'nın helikopteri de Aspendos'a gönderilecektir.

Mengî û 'Gelê tirk ê kurd'

Güngör Mengî. li Tirkîyeyê gelek kes wî kesî wek rojnamevan nas dikin. Lê haya zehfan jî ji hin taybetî, meşgale û îşguzarîyên wî tune. Halbûkî ew li ser antropolojî, sosyolojî, psîkolojî, şîretkarolojî û hwd. jî serê xwe diêşîne û xwedî îdiayên mezin e.

Nexasim jî li ser tesbîtîkirina kok û nîjada kurdan tu kar ji antropologan re nahêle û tesbîtên ecêb diafirîne. Di warê siyasî û civakî de jî hîna ji vêga ve, tarîfa mafên gelan diafirîne û maf li wan belav dike. Li wan waran mijara wî di ser kurdan belav dike, wan jî nû ve tarîf dike, Mesela, dibêje gelê tirk ê kokekurd gerek e du sê heb mafên xwe bistînin. Ew li gor kêfa xwe mafan dide wan û li gor kêfa dilê xwe ji wan distîne, careke din dide wan û distî-

PKK terörünün Türkiye'yi bölmeyeceğini artık herkes biliyor. Şimdiki tartışma terörle mücadele için değil, siyasi ve askeri yollarla birlikte kullanılmasıyla ilgili çözümler bulunmasıyla ilgili. Birim de katıldığımız diyaloglar göre, askeri müdahale, PKK'yı halktan tecrit edecek olan kültürel ve siyasal hakları destekler. Se, daha kısa zamanda sonuca ulaşılması gerekiyor. Bu hakların şu dönemde konuşulması terörle mücadele için değil, terörün sona erdirilmesi için yapılıyor. Apo silah bırakmaya hazır olduğunu sık tekrarlamaya başlamıştır. Sansürümüz varsa keder Global Paradoks'un gerçekliği lideri şu dönemde Türkiye'nin karşısına çıkarır.

Güngör Mengî

Cênawer ji mêranî û merdiya xwe jî nayê xwar. Dixwaze mafê "kurdê tirk ê kurd" bide wan.

Antropolog, sosyolog, siyasetvan û rojnamevanê mafbelavker! Tu dixwazi mafên çandî mandî û hwd. bide gelê Tirk ê koka wan Kurd, tu dixwazi jî tiştê dî destê wan de ye ji wan bistîne. Gelek kesên din jî wek te hene ku îro li Tirkîyeyê jî kîsê xwe mafan didin û distînin. Hûn serbest in.

Gelê tirk ê kokekurd bila ji we re be. Gerçî ez hîn rastî gelekî li gor tarîfa we ne hatime lê dîsa ji ew ji we re.

Lê ji bir nekin gelê Kurd jî heye. Ew van mafên hûn belav dikin. Nexwaze. Ew bi xwe zane wê çawa mafên xwe bistîne. Bila gelê tirk ê koka wan kurd ji we re be, lê ji kerema xwe re mafên gelê kurd nedin!

M. ROJAVA

Xelata Xaçepirsê

Her hefte xaçepirsa me wê bi xelat be. Di pêvajoya 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê binixînin. Xelata wê heftiyê pirtûka **Faysal Dağlı, 'Birakuji'** ye. Peyva veşarî ya Xaçepirsa hejmaraya yekemîn: **Welatê Me Jêrenot:** Xelat wê bi usûla qurayê li deh kesan bîn belavkirin.



Birakuji
Faysal Dağlı

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

- | | | |
|---------------------------------|--|--|
| <input type="checkbox"/> 3 Meh | <input type="checkbox"/> Li Hundir
400.000 TL | <input type="checkbox"/> Li Derve
30 DM |
| <input type="checkbox"/> 6 Meh | <input type="checkbox"/> 800.000 TL | <input type="checkbox"/> 60 DM |
| <input type="checkbox"/> 12 Meh | <input type="checkbox"/> 1.600.000 TL | <input type="checkbox"/> 120 DM |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkîyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNIŞAN :

Navnişana Welatê Me
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 2491344 – 245 29 91

X A Ç E P I R S A B I X E L A T

	Dê	Sembola Oksijenê	Navê pişeyek	Giyayê avê
	Ap	Mirad	Simûçk	
Pirtûkeke Apê Musa Niviskarekî Kurd	É ku rîm bi kar tîne	Wezîfe	Xwerû	7
			Xebera xêrê	Parzeminek (Qitayek)
Taybetî	Deng	5	Çinavkek	Kromozom
Di wêneyê de tê ofîn	Notayek			
Damjîmêr	Rih	9	Kinnivisina Doktor	Jî pez û dewarî dotin
Şexsiyet	Nûgriştî		Pêxemberek	Kar
Reşahîyîna bîrê berçepê	6	Kwarinek	Meyger	8

PEYVA VEŞARÎ

WELATÊ ME

1 2 3 4 5 6 7 8 9

NIVÎSKARA XELATGIRTÎ NADINE GORDIMER HÊ JÎ ENDAMÊ ANC'Ê YE

TIŞTÊ BAWERIYA MIN PÊ BÊ EZÊ BIKIM

Romannivîs Nadine Gordimer, di romanên xwe de jiyana mirovên di bin nîrê rejîma nijadperest de rave dike. Wekî endameke aktif a Kongreya Afrîqaya Başûr (ANC) e. Wê di sala 1991'an de Xelata Nobelê stand. Kovara Newsweek'ê bi wê re li ser pirtûka wê ya dawîn, "Li Nik Min Kes Tune bû" û ya rewşa Afrîkaya Başûr hevpeyvînek kir. Em vê hevpeyvîne ji bo we li Kurdî werdigerînin û pêşkêş dikin.

Gelo karakterên di romanê de rewşa Afrîkaya Başûr a niha diyar dikin?

— Karakterên di romanê de bi xewnên xwe, bi jiyana xwe, bi hemû rastiyên xwe li vî welatî dijîn. Ev tişt her roj tîr serê mirovan. Jiholêrakirina rejîma nijadperest wê demeke dirêj bigire. Ji her qat û çînê gelek mirov ber bi navçeyan (qesebeyan) ve tîne. Demajoja (proses) ku ev navçe bibin bajar, wê wext bistîne. Niyet heye, qanûn ji

rê didin tercîhên ku berê bi dest nediketin.

Karakterên romanê ya sereke Vera Stark, ji bo lêgerîna kesîtiya xwe tîkiliyên kevneşopî û yê malbatî red dike. Gelo Vera Sîmbola, Afrîqaya Başûr a ku li nasnameya xwe ya nû digere ye?

— Na. Ev mînakek e. Diheyire, guherînen ku di civakê de çî dibin fêm nake. Wek nimûne, yekî Afrîqaner, rastgirê tûj heye, dixwaze sistema nijadperestiyê bi şûn ve bîne. Ji vî yekê ji ew diçe li

qunceki li bakurê Cape Townê bi tenê dimîne. Ez, wî û kesên ku ji welêt direvin dikim nava eynî kategoriyê.

Karakterekî ji romanê Mpho, wek keça kesên şoreşger e, lê ew li İngîlistanê mezin bûye. Li Afrîqaya Başûr ew ji çand û doza ku dê û bavê wê ji bonê şer kirine, gelek astengî kişandine, gelek dûr dixuye. Ev tişt, ji bo gelek mirovên ku ji sirgûniyê vedigerin rast e?

— Di nav gel de du çêşit mirov hene. Mirovên

wek Mandela ku 27 salan di girtîgehê de ma, wek ku gelek tade dîtine hene. Kes nikare bibêje, "Ew ji welêt veqetiyane". Ew ji welêt veqetiyane, lê şerê xwe yê li dijî nijadperestiyê di nav refê ANC'ê de domandin, di nav mercên giran de dijîyan. Helbet dema ew vegehin welêt, wekî qehremanan hatin nixandî, lê pir hindik bin ji mirovên ku ji welêt revîyan ji hebûn. Niha ew dizivirin welêt, hêvî dikin ku em wan wek qehremanan binin, lê ev tişt

pêk nayê.

Vera Stark çermspî ye, di avakirina ANC'ê de jî aktif e. Di dawiyê romanê de ji tevgerê dûr dikeve. Jiyana wê li ser çermspîyan dixwaze çî bibêje?

— Ez fêm nakim ka çî ma ewqas li ser mirovên çermspî tî rawestî, Çî bi reşîkan dibe, kes vî naxî. Niha ji bo me hemûyan eynî maf hene; kes li kesî zilmê nake. Çermspî bi piranî çî karî dikin? Karsaz in, bi karê pişesaziyê (endustriyê) mijûl dibin. Bi wan re bazareke giran tî kirin, lê rê nayê dayîn ku pişesazî ji hev belav bibe. Bi awayekî ku mirov bibêje, divê ew li vir bimînin, lê divê mirov hinekî bi ser wan ve here. Mandela û mirovên li dora wî vî tiştî baş dizanin. Hîn ku ANC qedexa bû, tîkiliyê wan bi giregirên endustriyê re hebû.

Hûn cihê xwe û yê piştgirên çermspî ku demeke direj di nav ANC'ê de cih girtin ji bo pêşerojê çawa dibînin?

— Mirovên wekî min tim di nava ANC'ê de cih digirin. Em dema ku tîkoşîn dimeşîya di navê de bûn. Ez miroveke ku xwedîya qerta endamtiyê ya ANC'ê bûm, ez ji bo xebatê li nik wan in. Çî karî ji min bixwazin, heke baweriya min pê were, ezê bikim.

Wergêr: S. TAN



Romannivîsa navdar Nadine Gordimer, piştî Xelata Nobelê stand, hîn zehftir bi problemên gelê xwe re eleqedar bû.

Ev pergala (nîzam) ku berî Şerê Kendavê hate ragihandin, hîn pir wext di ser de derbas nebû, ji aliyê propagandîstên wê ve wekî pergala bêpergal hat binavkirin.

Wexta Yekitiya Sovyetê ji hev belav bû, li gelek komarên wê, gelên ku heta wê demê di gel hev jiyabûn, ketin qirika hev. Li Yugoslavya di şerê navbera Sîrb, Boşnak û Hirvatan de bi hezaran mirov hatin kuştin. Li wan welatan bazara serbest bi xwe re serbestiya kedxwariyê û diziyê anî. Mafya li wan welatan bû hêza sereke. Bêkarî, xizanî, jinezde mirin bû qedera mirovan. Mirovên ku berê problemên bi vî rengî nas nedikirin, rûyê bazara serbest ya rastîn dîtîn. Karên pîs û bêexlaqî rûmeta mirovan xist bin

piyan. Ev sosyal demokratên ku qala sistemeke sentez dikirin, dîtîn ku hem li welatê kevne-sosyalîst, hem ji yê kapitalîst, sistem ber bi faşîzmê diçe, îro li gelek welatan partiyên faşîst gihîştine hêzeke ku wan berê nikaribû di xewnên xwe de ji bidîtana. Ne tenê li welatên kevne-sosyalîst, li welatên kapitalîst ên pêşketî jî rewşa kedkaran xerabtir bû, gelek mafên ku di dema du-sîstemiyê de kedkaran bi dest xistibû, ji wan hat standin. Bêkarî, xizanî li wan welatan jî her roj zêdetir dibe. Der heqê rewşa welatên kapitalîst ên lipaşmayî de jixwe ne hewce

ye ku mirov tiştêkî bibêje.

Piştî hilweşîna Yekitiya Sovyetê (YS), Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) li cîhanê bû hêza sereke. Reqabeta bi Yekitiya Sovyetê re rê dida ku hinek welat-welatan Alînegir bi serê xwe hereket bikin. Lê piştî hilweşîna YS'ê ev îmkân nema. DYA'yê êdî hukmê xwe bi darê zorê dimeşand. Li vir divê mirov qala aştiya Pergala Nû jî bike. Vê aştiya ku heta niha li tu waran pêk nehatibû, ji gelan re aştiyêke baş neanî. Li El Salvador û Nikaraguayê li ser navê aştiyê hêzên sosyalîst hatin tasfiyekirin, li

Angolayê, dema hêza kontra (UNITA) di hilbijartinê de bi bin ket, dîsa çek hilda destê xwe. Piştî di şer de ber bi tîkçûnê ve çûn, dîsa vegehin ser masayê aştiyê. Li Filistinê Arafat bû "Waliyê Gazayê" hîn jî şer û qetlîam didomin. Aştiya ku ji bo gel herî kêrhatî bû li Afrîkaya Başûr pêk hat û li wir jî rewşa kedkarên reşîk li ber çavan e.

Li vir ez nabêjim aştiyê tiştêkî xerab e, kes jî nikare vî yekê bibêje. Lê divê rengê vî aştiyê baş bê şîrovekirin. Wek encam ez dixwazim vî bibêjim, li ser hîmê kapitalîzma bêpergal a ku bi xwe li ser bîngeha anarşiya hilberiyê û xudanmaliya xusûsî ango kedxwariyê disekine, ji bo gelan pergaleke baş ava nabe.

SAMÎ BERBANG

PERGALA BÊPERGAL

FAL



BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Gava hûn bi dû dozekê dikevin, pir bi heyecan in. Lê sebra we heta dawîn dewam nake. Xwe pir newestînin, bi bêhna fireh li meseleyan binêrin.



GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn gazinê ji dora xwe dikin. Xelk ji halê we fam nakin û nizanin hûn ji bêdengiyê hez dikin. Xwe neqehêrinin û çavên xwe jî ji kirinên wan re negirin.



CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Di tşkiliya însanan de jîrbûna we, gelek deriyên girtî ji bo we vedike. Ji bîr nekin însan her tim bi hunera xwe nikare bigihêje her tiştî. Ji şexsiyeta xwe tawîzan nedin.



KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Gelek kes bi we bawer dibin û sirên xwe ji we re dibêjin. Hûn tiştên wiha meraq jî dikin. Gava diqewime, hûn ser didin û sirê nadin. Xwedê alîkarê we be.



ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Hûn pir çavfireh in. Derdora we vê niyetê bi xirabî îstîsmar dikin. Lê ev di heqê we de ye. Ji ber ku hûn bi pesnên xelkê, xwe zû winda dikin. Ev jî ne karê aqila ye.



SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Di payizê de pelên daran çawa li ba dibin, hizna dilê we jî di nava dilê we de li ba dibe. Dilê xwe bi xwe neşewitînin, ji ber ku haya kesî ji we çênabe. Îhtiyaca we bi sohbeta hevalan heye.



MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Lez û bezîtiya ku hûn di nav de ne, jiyana we ya malbatî xera dike. Van rojan hizûreke manewî ji we re lazim e. Carinan ji bo çendakî be jî, derkevin gerekê û insanên nû nasbikin.



DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Dev ji fedyokiyê berdin. Dêrdên xwe ji dost û hevalên ku hûn bi wan bawer in re bibêjin. Heke hûn wisa nekin, wê ev derd bibe wek jehrekê û wê di laşê we de bibe sebebê gelek nexweşiyên.



KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hayê we ji bayê felekê tune. Ji bo pêşerojê hûn karekî ji xwe re nakin. Dev ji peyva zêde berdin û bala xwe bidin karê ku li benda we ye. Ma hûnê dinyayê xelas bikin.



KARİK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Îhtirasên we di nav hevalên we de nexweşiyên çêdike. Her tim şîrê ter (fro) bi dest mirov nakeve. Dev ji serhişkiyan berdin û hinekî jî li hevalên xwe bifikirin.



DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Hûn wezîfeya xwe ya eslî nakin û bala xwe didin tiştê din. Tevlîhevî tesîreke nebaş li ser jiyana we dike. Di nêzîk de hûnê hewcedariya guherînan nû bibînin.



MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Vê heftiyê her roj, gava hûn rabûn, li dora xwe binêrin. Hinekî li însanan bifikirin. Hûnê fêm bikin ku qîmeta jiyana çiqas pir e û hûnê lê hay kevin, ku mirov çima ji bo jiyana şer dikekin.

Selîmoyê dîn û Qunsor beg



Rojekê Selîmê dîn diçe dikana Xêro. Jê tenekeyek rûn dixwaze. Dibêjê: "Ezê şanî hermeta xwe bidim ku bicibîne ezê pereyê wî bidim." Xêroyê dikandarî qebûl dike.

Selîmo, tenekeya rûn datîne ser milê xwe û diçe malê. Gava dibe malê di binê tenekeyê de qulek vedike. Nivê rûn jê dertîne. Paşî tenekeya nivco li Xêro vedigerîne û dibêjê: "Jina min ev rûn neciband. Bêhn jê tê."

Xêro gava radihêje tenekeyê dinihêre ku pir sivik e. Pê derdixe ku Selîmo binê wê qul kiriye û rûn jê deraniye.

Xêro û Selîmo diberisin hev. Gotinek ji wî, yek ji wî, tep û rep li ser û çavên hev

didin. Xêro bêhteng e. Radihêje nivkilo û li nivê çavê Selîmo dide. Dev û lûvên wî di nava xwinê de dimînin. Polisên Misircê (Qurtelanê) têne ser wan. Piştî herduyan jî dibin qereqolê.

Komîser pêşî ifadeya Xêroyê Dukandar distîne, paşî berê xwe dide Selîmoyê dîn û dibêje:

Selîm Sevda şimdî de sen sôyle bakalim (Selîm sevda niha jî tu bibêje).

Selîm bi tirkiya xwe ya qelew dikeve navê:

Qunsor beg! Qunsor beg! Ben Xêro'ya gîttî. Xêro'dan bir teneke yax aldî. Eve gotirdî. Hermetime gosterdî. Hermetim "Nivco dir", dedî. Bende jî Xêro'ya gotirdî. Xêro'ya "Nivco dir" dedî. Xêro aciz oldî.

Bene vurdî. Deh xiram dî, bîst xiram dî, çil kiloydî, pêncî kiloydî nizanîm. Atî Selîm sevda'nin bûrasina dey dî (serê xwe nişî komîser dide). Pa Qunsor beg ew çax erd û ezman bir oldî. Derziya Xwedê li ber çavên min bir gîttî bir geldî. Eger înanmiyorsin Qunsor beg, kardaşim Remo telaqî nî bir milyona vêrmez ona sor...

Komîser piştî gotinên Selîmo ji kenan piştî ziko dibê û jê re dibêje: "Selîmo lawo Xwedê belaya xwe bide te, biqêşite here."

Not: Ev bûyer di sala 1983'yan de li Misircê qewimiye. Îro Selîmo û Xêroyê Dukandarî hîn jî li vê navçeyê dijîn.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Kurdên bi terî û şikevtên nostalgîk

Tirkan, bi salan ji me re gotin "Kurdên biterî (bidûv)". Her ku dihat gotin, kurdan li paş xwe dinêrin, lê tu terî nedidîtin. Gava tayîna memûrekî derdiket mentîqeya kurdistanê, dê û bavê wan, an jî dost û cîranên wan kesian, ji wan re digotin xwedê we muhazeze bike. Ew kesên ku diçûn, lê dinerin Kurd ne bi terî ne, lê tiştê ku wan ecêbmayî dihişt, şikevtên ku kurd tê de dijîyan (ew şikevtên ku medeniyeta Babil, Sumer, Asûr, Gutî tê derbas bûye).

Wan kesên ku wiha digotin, lê nêrin ku li Ewropayê gelek kes malên xwe dixin şiklê şikevtan û bi li-

bas û eşyayên kevn, dixemilînin. Em dinerin hêdihêdî Tirk jî dikevin vê riyê. Vê carê em dibêjin xwedê wan muhazeze bike, ji ber ku êdî em dibînin

ku di nav Tirkan de kesên biterî jî çêdibin.

Kurdan bêterîbûna xwe îsbat kirin, lê ez bawer nakim dev ji şikevtên nostalgîk bernadin.



RASTIYA ME

A. İNANÇ

Ehmedê Xanî û Mem û Zîn

Di Mem û Zînê de yekbûn dihate xwestin. Welatparêzî dihate xwestin. Çêbû. Ehmedê Xanî çi digot? Li pêş yekîtiya kurd çi kelem hene? Axatî çi ye? Ên li dijî yekîtiyê kî ne? Fesad kî ne? Ruhê mezin çi ye...? kurd bi quwet bin... hukumdarekî wan jî çêbibe... Ew bi xurtî li ser van meseleyan disekinî.

Ev pirtûk, bi rastî ne bi tenê li ser Mem û Zînê ye. Li ser rewşa miletê Kurd e. Ew li ser hebûn û yekbûna gelê kurd hatiye nivisandin. Wê demê wiha bû. Eşqa wî, eşqeke welatparêzî bû. Wî yekîtiya hemû însanên kurd dixwest. Lê, nebû. Çima nebû? Xayîn mezin bûn, roj rojên wan bûn. Ji bo vê yekê jî, bi cih nehat. Belê, ne mumkûn bû ku, were cih jî.

Mem û Zîn mirî bûn. Niha ev tişt me hal kiriye. Ew xîyanet, hinek ji welêt û gel bi dûr hate xistin. Ên li dijî yekîtiyê, yên ku bi fesadiyê gel berdidin hev û li nav hevdu dixin, hinek ji wan jî navê hatin rakirin. Neteweya kurd, ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê gavekê bi pêş ve avêt. Ruhekî mezin çêdibe. Bi ser ve eşqeke mezin çêdibe û bi ser jî dikeve. Ez dikarim bibêjim, li ser


bîranîna Ehmedê Xanî jî, gaveke mezin hatiye avêtin. Ew semboleke nivîskar û hunermendan e. Em dixwazin li ser bîranîna nivîskarê mezin Ehmedê Xanî jî bisekinin. Li gorî dema xwe, ew tiştên ku gotine û nivisandine, çi ne? Ji 300 salî û bi şûn ve Ehmedê Xanî çi dibêje? Armanca wî çi bû, û çawa bi ser diket? Ew tiştên ku di Mem û Zînê de digot, çi bû, û ew

niha çawa bi ser dikevin? Bersiva wî ya siyasî û edebî hatiye dayîn. Ez bawer im, em wiha Ehmedê Xanî jî pêk tînin.

Ne eyb e ku mirov li ser kêmasî û şaşiyên xwe bisekine. Divê mirov kêmasiyên xwe bibîne û rast bike. Di wir de gerek e ku rewşenbîr xwe di bin çavan re derbas bikin. Ka kêmasiyên me çi bûn? Belê, emrê me bi pêş de çûye. Niha bi ruhekî nû emê çawa û çi bikin? Lê gorî demê rola me çi ye?

Heta niha her tiştê me di bin destê dijmin de bû. Dijmin zirarê dida her tiştên me. Ji vir û bi şûn de ne mumkûn e ku dijmin bikaribe zirarê bide. Di her âlî de însanên me yên mezin çêdibin. Xwe nas bikin. Xwe çêbikin. Ev dem demeke girîng e.

DI CENGE DE PSIKOLOJÎ



Berî ku şerê rizgariyê dest pê bike, malbatên tirk bi hêsanî zarokên xwe dişandin ji bo leşkeriyê. Lê îro bi girîn û şîn in, gelek ji wan jî zarokên xwe vedişêrin, an jî pereyên mezin didin ji bo neşînin leşkeriyê. Her diçe hejmara kuştî û dîlên ji artêşa tirk zêde dibin. Ev yek jî bandoreke mezin li ser psîkolojî û manewiyata artêşa tirk û li civaka wê dike.

Di şerê Cihanê yê Du-yemîn de, hêzên faşîst ên alman, piştî têkçûna îdeolojîk, siyasî û leşkerî, ketin rewşeke binkefî ya psîkolojîk û manewî jî. Heta gihişt wê delîvê ku, Hitlerê faşîst xwe kuşt. Di şerê navbera hêzên azadîxwaz ên Vîetnamî û Amerîkayê de jî em dikarin rastiya vê tespîtê bibînin.

Gava ku hêzên Vîetkongê (Eniya Rizgariya Vîetnamê) di warê îdeolojî, siyasî û leşkerî de bi ser ketin, di warê psîkolojî û manewî de jî serkeftinekê bi dest xistin. Lê hêzên Amerîkî û karbidestên wan, li Vîetnama Başûr ketin

tengasiyê, bi hezaran leşkerên wan jî qada şer reviyên, bi sedan xwe kuştin, bi hezaran hiş avêtin, nexweşînan psîkolojîk bi wan re çêbûn, heta nav li vê nexweşînan danîn "Sendroma Vîetnamê".

Vê yekê kir ku bi deh hezaran hemwelatîyên wê der-

ketin kolanên Amerîka û dengên xwe li hemberî serokatiya Amerîkayê bilind kirin û daxwaza xwe ya ji bo vekîşîna leşkerên Amerîkayê ya jî Vîetnamê anîn ziman. Dîsa em dibînin, di şerê navbera kedxwarên Fransa û azadîxwazên Cezayîrî de jî vê yekê xwe diyar kiriye

Piştî şer peyda bûna nexweşînan

Berê dema ku xortên kurd diçûn leşkeriyê, malbatên wan ew bi def û zirne bi rê dikirin. Lê îro xortên kurd bi dilgeşiyê xurttir berê xwe didin nav refên gerîla. Malbatên ku zarokên xwe dişînin leşkeriyê, nema dikarin di

nav civakê de serbilind bigerin. Ev yek jî guherîneke mezin e, hem di mejî de, hem jî di giyanê (ruh) de.

Hejmara leşkerên tirk, her roj hinekî din kêmtir dibe. Li gorî rayedarên dewletê hejmara kesên ku ji leşkeriyê di-revin 250 hezar e. Di nav civaka tirk de jî, şandina zarokan ji bo leşkeriyê her diçe dibe geleşke mezintir.

Berî ku şerê rizgariyê dest pê bike, malbatên tirk bi hêsanî zarokên xwe dişandin ji bo leşkeriyê. Lê îro bi girîn û şîn in, gelek ji wan jî zarokên xwe vedişêrin, an jî pereyên mezin didin ji bo neşînin leşkeriyê. Her diçe hejmara kuştî û dîlên ji artêşa tirk zêde dibin. Ev yek jî bandoreke mezin li ser psîkolojî û manewiyata artêşa tirk û li civaka wê dike.

"Çima kurê Doğan Güreş naçe şer!"

Di van mehên dawî de, desthelatdarên tirk xwestin moral bidine civak û artêşa xwe. Ji hêla din ve jî çend mehên din li wextê leşkeriyê zêde kirin.

Me dit ku çawa dayîka leşkerê li ser cendekê kurê xwe hêstir dibarandin û digot: "Çima kurê Doğan Güreş naçe şer?" Me dit ku çawa malbatên leşkerên dîlketî, nerazîbûna xwe ji fermanariyê re eşkere dikirin û kêfa xwe ji mirovahî û rastiya gerîla re dianîn.

Dîsa di van rojan de firarên ji leşkeriyê zêde bûne. Li çend cihan xwekuştin û li hin deveran jî pevçûn di navbera leşker û serbazên wan de qewimîn.

Niha piştî me ev rewş diyar kirin, êdî tu mij û moran li ser meseleyê nemaye. Ango manewiyat û psîkolojîya leşkerên kedxwaran û malbatên wan li ber çavan e.

X. ELKÎ

MEBÛSÊ BERÊ YÊ PARTIYA KARKERÊN TIRKIYÊYÊ (TÎP) RONAKBÎRÊ KURD Û HEVALÊ

LI TIRKIYÊYÊ DEWLET EŞÎRET E!

Ji kuştina siyasetvanê kurd Wedat Aydın û bi vir de çî li Kurdistanê û çî li Tirkîyeyê bi hezaran Kurd (ji her tebeqeyê) hatin kuştin. Di beyanatên resmî, rûpelê rojnameyan û di ekranên televizyonan de ev kuştin bi du peyvan hatin binavkirin: "Failî Meçhûl". Kuştina Kurdan, ya ku ji aliyê hin hêzên tarî ve çêdibû, dibû cinayetên ku "failên wan meçhûl" in. Di van demên dawî de li bajarên Tirkîyeyê gelek dewlemend û ronakbîrên kurdan hatin kuştin. Li ser van meseleyên nû, wekî kuştina Behçet Cantürk, Savaş Buldan, ebûqat Yusuf Ekinci û Medet Serhat, me bi mirovekî ku di nav meseleyan de ye, kekê Yusuf Ekinci, ronakbîrê Kurd Tarık Ziya Ekinci re hevpeyvînek çêkir. T. Ziya Ekinci, li ser van meseleyan, kitêbekê hazir dike.

Li Tirkîyeyê bi dû kuştina ebûqat Medet Serhat re dîsan dosyaya cinayetên ku "failên wan meçhûl" in, ve-bû. Birayê te Yusuf Ekinci jî li Enqereyê sala çûyîn bi vê riyê hate kuştin. Hûn dikarin ji me re qala meseleya cinayetên ku "failên wan meçhûl" in, bikin?

- Cinayetên "failên wan meçhûl" in, êdî bellî bûye ku bi hin wesîteya teşkilatan ve tên kirin. Ev teşkilat di nava dewletê de û di bin himaya wê de ne. Ên ku tên kuştin, sirf ji bo ku ji dewletê hez nakin û muxalîfê dewletê ne, li gorî dewletê xayin, yanî Kurd in.

Kî di xizmeta kê de ye?

Ji dewra Osmanî û bi vir de dewlet, wekî tiştêkî muqedes, tê telaqîkirin. Li gorî vê telaqiyê, lazim e ferd ji bo dewletê be, ne dewlet ji bo ferdan be, yanî xelk ji bo dewletê bin. Di qanûnnameya Kanuni Sultan Süleyman de reisê dewletê, padîşah, ji bo selameta dewletê, caiz e ku law û birayê xwe bikuje. Halbûkî di dewra îro de civat tiştêkî muqedes e, ne dewlet. Dewlet, lazim e di xizmeta insanan de be. Wexta te dewlet muqedes

kir, divê tu insanan bikujî û feda bikî. Gelek kes, xwe di vê meseleyê de bi wezîfe dibînin û dîtine. Mîsal; İsmet Paşa, Süleyman Demirel memûrên dewletê ne û dikarin ji bo beqaya (hebûna) dewletê, bi hezaran insanan bikujin. Ji xwe ewên esker, ji herkesî bêhtir li beqaya dewletê bi xwedî derdikevin.

Li Dêrsimê, çendek berê gelek gund hatin şewitandin. Muxtarên wan gundan, li Enqereyê, bi başwekil (serokwezîr) re peyivîn. Serokwezîr li wir got ku tu carî dewlet û esker, gundan naşewitînin û ev îftira ye. Lê ew muxtar, ji ber ku gotibûn eskeran gund şewitandine, hatin kuştin. Ji bo çî ew hatin kuştin? Wan tiştêkî xerab nekiribûn. Lê li gorî dewletê ew bûbûn xayin. Termên wan li ber çeman, li kêleka rîyan hatin dîtin. Navên wan muxtaran, li cem min qeydkirî ne.

Wedat Aydın, şehîdê ewilî bû. Wedat, mirovekî demokrat, li heqê insanan digeriya, serokekî HEP'ê bû û gelek carî ketibû qirika polîsan, bi wan re munaqêşe kiribû. Wedat, ji aliyê polîsên ku berî revandinê bi rojekê bi wan re munaqêşe kiri-

PORTREYA JIYANA TARIK ZIYA EKINCI

Tarık Ziya Ekinci, di sala 1925'an de li Licê ji dayika xwe bûye. Di 1943'an de li Stenbolê dest bi Unîversîteyê, beşê Tibbiyê kir. 1949'an de Tibbiyê qedand. 1953'an de ji bo ihtisase çû Fransayê. Di sala 1963'an de li Diyarbekirê teşkilata Partiya Karkerên Tirkîyeyê (TÎP) ava kir. Di 1965'an de, ji vê partiyê bû mebûs. Du salan jî wezîfeya Sekreterê Partiyê yê Giştî kir. Di Adara 1982'an de, ji ber tadeyiyên cuntaya leşkerî, diçe Fransayê. T. Ziya Ekinci, gava qala wan salan dike, meseleya xwe û ya Binbaşî Esat Oktay Yıldırım ji dibêje: "Rojekê ez dîsan girtim binçav, ji ber ku wan gelek caran ez girtibûm, Esat Oktay Yıldırım ji min re got: "diya min bibê jina min be tu careke din were vira, ezê te bikujim." Li gorî gotina wî, piştî vê tehdîdê ew mecbûr maye ku dev ji Diyarbekirê berde.

Tarık Ziya Ekinci, ji sala 1989'an-ê bi vir de li Stenbolê dijî.

bû, hate revandin. Ji bo cara ewil bû, tu tedbîr nestandibû. Gava polîs tîn wî dibin, ji jina xwe re dibê, "Ez van polîsan nas dikim, emê heta qereqolê herin." Piştî re jî wekî hûn zanin tê kuştin.

Dewlet te dikuje, tu tiştêkî nakî


Li pey Wedat, İsmail Kocakaya hate kuştin. Gava polîs tîn wî ji Çarşiya Sanayiya Diyarbekirê dibin, lawê wî numroyên du teqsiyên polîsên sivil li cem xwe dinivîse. Min ji bo wî ji Süleyman Demirel re mektûp şand. Piştî şandina min bi mehekê cewap hat. Saet di 2'ê şevê de 2 polîsên serxweş, li deriyê min xistin û go-

tin me cewaba mektûba te anî. Ji bo nushayek bû, min kopiyekê wê di wê saetê de nikarîbû bistenda. Demirel, di cewabê de digot min tetkîk kiriye ku İsmail Kocakaya mirovekî baş e, lê dibe îxtilafên wî, bi ew kesên eroînê difroşin, yanî mafyayê re, hebin û ji ber wê yekê hatibe kuştin. Ji bo herdu numroyên plaqeyên teqsiyan jî ev digot: "Ew herdu numro rast in û yê teqsiyên me, yê li Emniyeta Diyarbekirê ne; lê ihtimal heye ku mafyayê ew teqlid kiribin". De were qebûl bike. Dewlet te dikuje; di destê te de bi hezaran delîl hene û tu nikarî tiştêkî bikî. Wê ferd, çawa

mudafa xwe li hemberî dewletê bike? Îro Tirkîye, di vê ehwalê de ye, yanî dewlet li Tirkîyeyê eşîret e. Gava eşîret-emrê kuştinê bistîne, hinek diçin wî emrî tînin cih. Halbûkî dewlet, lazim e karên xwe li gorî qanûnan bikin. Dewleta ku têkeve vê riyê, ew wesfê dewletbûnê winda dike û dibe eşîr.

Demirel îşareta kesekê vexist!


Di zemanê Demirel de cinayet pir bûn û wî izin daye van tiştan. Yanî Demirel îşareta şîn (kesk) vexistiye. Emrê cinayetên Demirel daye. Gava mirov li kuştinan binêre wê bibîne ku temamî cinayetên, li



Wedat Aydın (10.7.1991)



Musa Anter (20.9.1992)



A.Cem Ersever (5.11.1993)




Behçet Cantürk (16.1.1994)



Savaş Buldan (3.1.1994)

MEDET SERHAT, TARIK ZİYA EKİNCİ LI SER KUŞTINA KURDAN JI ME RE PEYIVÎ:



Bêje ez çî bikujim ji min re feyde ye. Zaten xwende û dewlemendên kurdan hindik in."

hemberî kurdan hatine kirin.

Demirel di 24.1.1993'yan de li ser kuştina Uğur Mumcu beyanate dide rojnameyan û dibêje li Tirkîyê sê cinayetên ku "failê wan meçhûl" in, mane. Di vir de Demirel du xeteyan dîke. Yek; cinayeta Uğur Mumcu (Bahriye Üçok, Çetin Emeç û Muhammer Aksoy) û wek failê wê meçhûl nabîne. Dudu; Demirel dixwaze dibêje cinayetên ku li Diyarbekirê, li Batmanê, li Silwanê, li Nisêbîn û yên din ne cinayetên ku failê wan meçhûl in. Yanî jê re failê wan ne

● "Di zemanê Demirel de cinayet pir bûn û wî izin daye van tiştan. Yanî Demirel piştî bû serokwezîr, îşareta şîn (kesk), ji bo cinayetên vexist. Emrê cinayetên Demirel daye."

● "Di nav dewletê de pênc teşkilat, cinayetên çêdikin. Mesela Wedat, Behçet, Savaş, Yusuf û Medet, bi destê polisên sivil, Musa Anter, Mehmet Sincar, Mehmet Can û hevalên wî, îtirafçiyên, Namık Erdoğan bi destê ülkücüyan li gundan jî qoricî, hinek cinayet jî, bi destê hizbullahçiyên tên kirin."

meçhûl in û ew zane.

Hûn dibêjint heta nîha bi tenê kurd tene kuştin?

– Erê. Lê Binbaşî Ahmet Cem Ersever û du peyayê wî, ji bo ku xayintî bi dewletê re kiribûn, ew jî hatin kuştin.

Piştî beyanata lîsteya Serokwezîr Tansu Çiller, gelek dewlemend û ronakbîrên Kurdan hatin kuştin: Gelo eleqeya Çiller bi van cinayetên heye?

– Mirov nikare tiştê bibêje. Lê elbette Çiller jî wekî Demirel di nava van tiştan de ye.

Li bajarê mezîna pêşî, Behçet Cantürk kuştin. Lazîm bû ku ew bihata kuştin, ji ber ku ew dewlemendê kurd bû. Paşî Yusuf (Ekinci) kuştin. Eleqeya wî bi siyaseta tune bû. Nedi-

ket daweyên ku bi ihtilaf û yê siyasî jî.

Îşareta cinayetên hingulîsk!

Evên ku cinayetên dikin, îmza xwe lê dixin. Yanî îşaretên wan hene. Piştî revandina kesên nasnameyên wan ji ser wan hiltînin, ji xeynî hingulîskên (gustîlk) wan. Wedat, Behçet, Savaş, Yusuf, Namık Erdoğan (Di Wezareta Sîhetiyê de musteşar bû), du birayên galerîcî ku ji Fatîhê (navçeya Stenbolê) hatibûn revandin û gelek kesên din, li ser wan ev îşaret, yanî ji xeynî hingulîskê pê ve tiştê nedihîştin.

Li gorî îdiayan, ew kesên ku hatin kuştin, ji ber hesabên nav Mafyayê bûn. Hûn çî dibêjin?

– Dewlet dibêje ev mensûbên Mafyayê ne û hevdu dikujin. Ev vîreke pir mezîna e. Hema ez bibêjim Yusuf, eleq-

ya wî bi Mafyayê re qet tune bû.

Tê gotin ku Yusuf ebûqatê Behçet Cantürk bû?

– Ne ebûqatê wî bû. Ebûqatê wî be jî, nayê wê maneyê ku bê kuştin. Gelek ebûqatên Cantürk hebûn, wek mîsal Prof. Uğur Alacakaptan û Cevdet Yarıdım.

Mirov dikare bibêje dewlet, di bin navê meseleya Mafyayê de gelek kesên dîkujin û Mafya dîke sebaba van kuştinan?

– Dewlet dibê ez çî bikujim, ji min re kar e. Jixwe xwende û dewlemendên kurdan, hindik in. Wan heb heb dikujin. Ev, jenosîd e. Jenosîda xwende û dewlemendên kurdan in. Yê ku li şerqê Tirkîyê hatin kuştin jî xwende (ebûqat, muhendîs, mamoste û kesên xuyanî), yanî dînamîkê xelkê kurd bûn. Kuştina van, bi za-

nebûn e, ne beredayî ye.

Pênc teşkilatên ku cinayetên dikin

Li hemberî van ez dikarim tiştê bibêjim. Teşkilata emniyeta Tirkîyê, mezbût e. Pir baş dixebite. Ewê ku failê wan ne di nav zanebûna dewletê de bin, di cî de wan derdixin holê. Wek mîsal li Tuzlayê (navçeyeke Stenbolê) meseleya bombeyê, di nav hefteyekê de derxistin holê. Dewlet dikare tiştên wîha ku ji aliyê teşkilatan ve bi aqilî tî çêkirin, di nav çend rojan de derxîne, lê cinayetê ku ew zane, wisa dihêle. Yanî kevir datînin ser meseleyê. Ev jî meşrûiyeta dewletê fiilen radike. Ma hebûna dewletê ji bo çî ye? Ji bo ku însan, yanî civat di nav rehetiyê de bijî. Dewleta Tirkîyeyê bi van cinayetên, meşrûiyeta xwe wînda kiriyê.

Teşkilatên di nav dewletê de qerara

kuştinê didin, bi pênc grûban re dixebitin. Ev teşkilatên taşeron cinayetên dikin. Mesela Wedat, Behçet, Savaş, Yusuf û Medet û gelek kesên din; bi destê polisên sivil, Musa Anter, Mehmet Sincar, Mehmet Can û hevalên wî; îtirafkarên, Namık Erdoğan û yekî din li Enqereyê; bi destê ülkücüyan (nîjadperestan) hatin kuştin. Ji xeynî van jî li gundan qoricî (çeteyên gundan) cinayetên dikin. Hinek cinayet jî bi destê Hizbullahçiyên tînin kirin."

Herkes dizane ku ev cinayet li hemberî kurdan çêdibin. Kurd, hem li Tirkîyeyê û hem jî li Ewrûpayê, ji aliyê hiqûqî ve dikarin çî bikin?

– Ji ber kurd ferd in, karê me zor e. Lê deriyên mehkemeyên Ewrûpayê vekirî ne.


Hevpeyvîn:
KEREM ASLAN

ÇEND DETAY

Binbaşî Ahmet Cem Ersever, bi beyanateke xwe ya ji rojnameyê re gotibû ku Alaattin Kanat ji Zîndana Diyarbekirê, di nav salên 1991-93'an de 11 caran derketiye derve. Ev agahî, ji aliyê Mudurê Zîndana Diyarbekirê ku wek bersiva pîrsekê di 4.8.1993'an de, ji Dozgerê (sawciyê) Cumhuriyetê yê Diyarbekirê re şandibû jî, hate dayîn. Mudurê Zîndanê vê dibêje: "Me yazdeh caran îtirafkar Alaattin Kanat berdaye, li ser emrê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ya Diyarbekirê, ji bo alîkariyê bide hêzên emniyetê. Alaattin Kanat di tarîxa 21.2.1993'an (tarîxa cinayeta Serokê Komeleya Mafên Mirovan (IHD) ya Elezîzê Metin Can û endam Hasan Kaya), 20.9.1992'an (tarîxa kuştina Musa Anter) û 4.9.1993'an de (tarîxa kuştina Mebûsê Mêrdîne Mehmet Sincar), bi emrê mehkemeyê hatîye berdan."

Li Kurdistanê û bajarên Tirkîyeyê ji sala 1990'î û bi vir de îstatîstîka kesên ku bi riya cinayetê "failê wan meçhûl" in, hatine kuştin ev in: * 1990: 44, 1991: 68, 1992: 732, 1993: 540 kes.

*Not: Li gorî îstatîstîkên Komisyona Heqên Mirovî ya Meclîsê.



Medet Serhat (11.11.1994)

Gerîla avêt ser şantiyeya TPAO'yê

27.11.1994

Li gundê Zokê ku bi Misirca Sêrtê ve girêdayê ye, gerîlayan du gerîdeyên (erebe) Belediyeya Xana Hewêlê (Baykan) şewitandin. Hefteya din jî gerîdeyê ke wê belediyeyê şewitandibûn.

Li Stenbolê, li navçeya Fatihê du buroyên muxtaran hate molotof kirin. Bûyer endamên ERNK'ê hildan ser xwe. Livbazî jî bo pîrozkirina salvegera PKK'ê hate kirin.

28-29.11.1994

Gerîla bi ser Qerekola Wezrikê ku bi Kerborana Mêrdînê ve girêdayî ye, girt. Di cerdê de 4 leşker mirin û 2 leşker birîndar bûn.

Li nêzikê gundê Tepecik ku bi Kocaköya Diyarbekirê ve girêdayî ye, gerîla avêt ser şantiyaya TPAO'yê. Di êrişaya gerîla de leşkerek û 3 çeteyên gundan mirin.

Gerîla li nêzikê Qerakola Görendorukê riya Duhê-Şirnexê birî. Rê seat ji 8'ê şevqê heya 15.00'yê êvarê kontrol kirin. Di kontrolê de du kes jî ber ku alîkariya dewletê kirine, jî aliye gerîyan ve girtin.

Li Enqereyê li tenga Cadeya Libyayê pankarteke bombekirî hate daleqandin. Li ser pankartê nivîsa "Bijî 27'ê Sermawezê, Bijî PKK" hebû. Livbaziye YCK (Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê) hilda ser xwe.

Li Stanbolê, li Altunizade Çarşıya Kapitolê di dikana mîgrosê de bombe teqiya. Pênc kes birîndar bûn. Livbaziya bombeyê, Timên Tolhildanê yên Metropolê ya ARGK'ê hilda ser xwe.

30.11.1994

Li navbera Dêrsim û Xozatê di nav gerîla û leşkeran de şer derket. Di heqê mirî û birîndaran de agahî nehate standin.

Lê çola navbera Licê û Pasûra Diyarbekirê gerîla bi leşkerên ku derketibûn operasyonê re şer kir. Di şer de 4 leşker û gerîlayek mirin.



ÇEND SAET JI JIYANA ŞERVANA...

Şemala hîvê bi pêlên çem re dikişiya

Biharek ji biharên gundên me ye. Hêşinahî rûyê erdê girtiye. Avê kaniyan di quntarên çiyayê de diherikin, çirav bi çirav digihîjin hevdu. Bêhna gul û gulçinan, dengê teyr û tûyan bi avê re berê xwe dide deştê. Bi sira hênîk re bêhneke xweş li rûyê mirov dixê. Ev harmoniya xweşik, di xem û xeyalên dilê mirov de bahozek çêdike, kêsera dil gûr dibe.

Em li kêleka Aşê Xerabê rûniştine. Çiloyên daran bi tavê re kesik bi kezik diçilwilin. Şûna pê û pêgeha dorçiyayê nanê çûçê derketiye. Fatfatok bi bayê brûskê re di ber me re dibezin. Di nav van xemgîniyan de dengê nerm bi ser min ket, "Heval, heval!" Min serê xwe bilind kir. Çavên min rê dikişand. Heval hemû bi hev re li min nihêrin û kenîyan.

Em deh kes bûn, bi komutan ve yanzdeh. Du heval li ser gir nobedariyê dikirin. Me jî xelek girtiye, em rûniştine. Komutan şitlek ji darê şikand, li rûyê erdê planên xwe çêdikir.

Riya me gelek dûr bû.

Me xwe di pîvazan de çal kiriye. Raket û keleş li ser darên mekîneyê rêz bûne, destê me li ser tetikan e. Em nêzikî qereqolê bûn, mekîne jî hingî çû giran bû. Cenderme li ber qulûbên xwe nobetê digirin û ketine xem û xeyalan. Lempên qereqolê veketî ne, qêrîn û kenên wan ji hundur tê. Em tam çûne pêşberî wan, serê xwe bilind kirin û li me nihêrin. Mekîne hinekî din giran bû. Ew nişana me bû.

Divê em di dora navçeyê re biziviriyana. Lê riya me wisa pir dûr diket. Ji ber wê Komutan got:

Hevalino, pêşniyareke min ji we re heye. Ez dibêjim em riya xwe kin

bikin. Serê êvarê, hêdî hêdî bikişin nav bajêr. Dibe ku em nêçirek jî bikin.

Heval li ser peyivîn, biryara me bû yek.

Em her diçûn

Em giran giran ber bi navçeyê ve meşiyayn. Me xwe da ser girekî. em di nav hêşinayî û xilxilên keviran de, li benda êvarê rawestiyayn. Rê, di binê gir re derbas dibe. Mekînen koçeran diçûn, qîrînên zarokan tevî gurînên mekînan dibin. Em bi kêf cixarên xwe dikişînin, tebata me nayê.

Ro çû ava, em peyayî devê rê bûn. Mekîneyek hat, me da rawestî. Şofêr peya bû.

Me jê re got:

Tê me bibî, di navçeyê re derbas biki.

Şofêr li rewşa me, li çekên piştê me nihêrî, tirsîya û got:

Welehî ha ji we re mifta mekîneyê, ez bi we re nayem.

Hevalek me miftê ji dest şofêr girt, got: "Hevalino, baz bidin."

Me baz da mekîneyê, çî! Pîvazê kelle bar kiriye. Hevalê şofêrî dikir, got, "Ezê di nav sükê re bimeşim, hûnê li gorî

meşa min karê xwe bikin."

Mekîne hêdî hêdî kete navçeyê. Şev dereng e, tek tûk seyên tol û beqî di kolanan de digerin. Mekîne li kil û kortên navçeyê dixê, pîvaz bi vî alî û bi wî alî dihilşin. Bekî li meşa mekîne dinihêrin, tiştêk jê girê nadin. Car din dibe qêrîna fiqên wan, pêgermokê digerin.

Mekîne û şev

Me xwe di pîvazan de çal kiriye. Raket û keleş li ser darên mekîneyê rêz bûne, destê me li ser tetikan e. Em nêzikî qereqolê bûn, mekîne jî hingî çû giran bû. Cenderme li ber qulûbên xwe nobetê digirin û ketine xem û xeyalan. Lempên qereqolê veketî ne, qêrîn û kenên wan ji hundur tê. Em tam çûne pêşberî wan, serê xwe bilind kirin û li me nihêrin. Mekîne hinekî din giran bû. Ew nişana me bû.

Bi derbeyekê me deng bi keleşan xist. Girmîn kete qereqolê, agir û dûman bi ser ket. Qêrîn û zarînen nobedaran bilind bû. Qereqol bi tevî bajêr ji binî ve lerizî. Xe-

wa bajariyan herimî. Seyên tol, dêlên xwe xistine nav lingên xwe, ketin kolanan. Defa hewarê lê ket, birqetav şevê girê da. Mekîneya me xaz dayê, me navçeyê di nav helebezê de wek xewneke ji para, hişt.

Dengê keleşan

Rê li devê çem dikişê. Em rabûne ser xwe, şemala hîvê bi pêlên çem re dikişê, rûyê me ronî dibe. Dilên me kêf û şewq girtiye, stranên me tevî hênkaya êvarê dibin. Me carek nihêrî bû qêrçîn, teqîn û girmegirm. Dinya li serê me hate hev, em ketin tariyeke şevê. Qasek wisa derbas bû, me nihêrî ber çavê me piçek ronî bû. Destê hêdî hêdî pîvazan ji ser serê me dida alî. Çavên me di nav pîvazan de dibilbisî û şofêrê me çawa dikene.

Bi wê kêfê dikeve çivare û qontrola xwe winda dibe. Me xwe ji pîvazan dawêşand, em derketin ser rê.

Toterikên mekîneyê li stêrkan dinihêrî.

Xelas xelasê Xwedê ye, lê pîvazan em xelas kirin.

MEHMET DURAN

DOH Û ÎRO REWŞA EDEBIYATA KURDÎ (1)

Destpêka berhemên nivîskî

Gelê kurd li Rojhilata Navîn gelekî binetîhî i kevne. Xwediyê kultura Mezopotamyayê ye. Bingeha kultura wê digihîje çend hezar salan. Mirov dikare bibêje ku gelê kurd hevpar û hevkarê kultura kevn a Mezopotamyayê ye. Ji berê miladê ve gelek dewlet û împaratorî çavên xwe berdane ax û şaristaniya (medeniyeta) herêmê. Roma, sasanî, ereb, moxol, tirkên selçûkî û osmanî... Li ser axa kurdan û gelên din ên herêmê yek li pey yê din hatiye, talan û wêran kiriyê. Çand û wêjeya kurdî jî her weha di bin lingên xwe de pelçiqandine û birine. Şertên nivîsandin û komkirinê jî nehîştine. Li hemberî van êrişên dagirker û talanker kurd ji aliyekî ve nikaribûne dewleteke yekgirtî û merkezi çêbikin. Wekî mîrîti parçe parçe mane û serxwebûn û otonomiyên xwe di nava wan dewletan de parastine. Esker û bac dane dagirkeran. Ji ber vê yekê îmkânên wêjeya kurdî ya nivîskî gelekî kêmtir maye. Piraniya berhemên edebî bi devkî di nava gel de mane. Ji aliyê din ve, ronakbîrên kurdan heta demekê bi zimanê biyanî nivîsandine û niha jî nivîsandina bi tirkî berde-wam e.

Klasikên Pêşî

Klasikên kurdî yên nivîskî di navbera sedsalên 10 û 19'an de mane. Piraniya giraniya berhemên edebî ji aliyê meleyên kurd ve, di medreseyan de hatine nivîsandin. Giraniya wan jî helbest in. Ji wê demê çirokên ku hene jî bi awayê helbestkî hatine nivîsin. Di wê demê de, berhemên ku bi nivîskî hene û di dest de mane bi kurmanciya jorîn in. Mirov dikare bibêje helbestvanê yekemîn **Eli Herîrî** ye. Eli Herîrî di sala 1010'an de ji dayik bûye. Ji helbestvanê klasik ên bi navûdeng yek jê jî, **Meleyê Cizîrî** ye. Meleyê Cizîrî di sala 1160'i de, li Cizîrê hatiye dinê. Meleyê Cizîrî di nava hevçerxên xwe de, helbestên bi herî kalîte, xurtnaverok û edebî nivîsandine. Wiha tê gotin ku Meleyê Cizîrî li ser teht û zinarên Cizîrê rûdinişt. Berê xwe bi



Meleyê Cizîrî



Ehmedê Xanî



Pertew Begê Hekarî

Çemê Dicleyê ve dikir û dest bi xwendina helbestên xwe dikir. Li xwendina helbestan sor dibû. Bi seatan helbest dixwendin. Kevir û teht ji hêrs û heyecana Mele sor dibûn. Pişt re dema ew ji cihê xwe diçûn, wê gavê keç û jinên Cizîrê hevîrê xwe dibirin, li cihê kevir û tehtên ku ew rûniştibû û helbest dixwendibûn, didan û nanên xwe dipijandin. Yanî kevîr û teht di bin wî de wekî tendûrê sor dibûn. Ji helbestvanên klasik yek jê jî, **Feqiyê Teyran** e. Feqî jî, helbestvanekî mezin e. Ji bo wî jê tê gotin ku ew-qas helbestvanekî bi navûdeng bû ku ew diçû nava daristanê bi helbestên xwe ve bi çûk û teyran re diaxivî. Ji ber wê yekê navê wî Feqiyê Teyran lê kirine. Feqiyê Teyran berhema xwe ya bi navê **Şêx Senan** di sala 1030'i de nivîsiye. Ev berhema wî ya heja niha wekî pirtûk di destê me de ye.

Ber bi dema nû ve

Ez dixwazim bi **Ehmedê Xanî** ji dema klasik derbasî dema nû bibim. Ehmedê Xanî ji helbestvanîyê bêhtir feylezofekî kurd e. Wî, di sala 1695'an de **Mem û Zîn** nivîsiye. Mem û Zîn çiroka evîndariya xort û keçeke kurd e. Mem û Zîn şaheser e. Ehmedê Xanî di şexsê Mem û Zînê de rewşa Kurdistanê ya wê demê ji aliyê siyasî û civakî ve aniye zimên. Wî di Mem û Zînê de, li ser sedemên bindestî û dagirkeriya Kurdistanê ya wê demê rawestiyaye. Niştimanperweriyê derxistiyê pêş. Yekîtiya kurdan parastiyê. Belavbûn, bêçaretîya kurdan di çirokê de bi awayekî vekirî û zelal daye diyarkirin.

Piştî sedsala 19'an êdî mirov helbestvan û nivîskarên ku bi kurmanciya jêrîn dinivîsinin jî dibîne. **Hacı Qadirê Koyî** (1815-1892) bi kurmanciya jêrîn helbestên gelekî heja nivîsandine. Her wiha **Şêx Reza Telebanî** (1842-1910), **Mele Mehemmedê Koyî** (1876-1943), **Zîver**, **Sebrî**, **Salim** (1885-1869), **Qane** (1898-1960), **Piremêrd** (1868-1950) û hwd...

M. XARPÊTÎ

DEFTER

Rewşenbîrî rûmet e

Rewşenbîr kî ye? Di nav doza azadiyê de fonksiyon û rola rewşenbîran çi ye? Ruh û jiyana rewşenbîriyê emê çawa bi pêş ve bibin? Ev, mewzû û meqsedeke mezin e. Ji Yewnana Kevn heya vê gavê, cihanê gelek rewşenbîrên binavûdeng dîtine. Em îro felsefe û pirtûkên wan dixwînin. Em rewşenbîrên Kurdistanê li ku derê ne, xîret û xurtiya me çi ye? Di nav dîroka dinê de rewşenbîr û alimên kurdan cihê xwe girtine. Îro kurd di nav çand (kultur)a xwe de yek û yek wan dinasin û didin nasîn. Ji **Ehmedê Xanî** heya îro cihê gişkan heye, lê belê em mecbûr in, wan bi fikr, jiyana û felsefeyên wan, bi nivîsarên wan, bidin nasîn. Bi rastî ji bo zarokên me, ji bo jiyana me jî ev tişt elzem e. Em dikarin ji wê xebatê re bibêjin, dîroka edebiyata kurdî. Bêşik vê xebata me îro dest pê kiriyê û bi pêş de diçe. Lê belê niha li Kurdistanê, li derve rewşenbîr çi dikin; çi dinivîsin; çi dixwînin; kovaran çawa derdixin; di warê fikr û felsefeyê de çi dikin? Rewşenbîr, ronahiya gelê xwe ne, rê dizanin, qaideyan



YAŞAR KAYA

dizanin, fikra wan heye, felsefeya wan heye. Heke gel bindest û reben be, ji bo xelabûna gelê xwe xebatê dikin. Dibin serokên civînan, dibin şoreşger û zana. Di nav şerê azadiyê de jiyana xwe berde-wam dikin. Teşkilat û partiyana ava dikin, destûra partiyana dinivîsinin, didin ber çavên gelê xwe. Dîroka gelê xwe dinivîsinin, edebiyata gelê xwe bi pêş de dibin. Li ber deriyê zîndanana, li dadgehan hevalên xwe diparêzin. Doktorê gelê xwe ne, li çiya û baniyan in, dost û dijminên gelê xwe dinasin. Di nav gel de, di serhildanan de, di mirin û mayîne de li cem gel in. Jiyana wan jiyana gel e. Carinan tê de mirin jî heye. Em dikarin bibêjin sed û pêncî sal e; qedera rewşenbîrên kurd gişkan mîna hev e, gişk li surgûnê ne, li zîndanana in. Ev qedera me ye, heq e em vê qedere biguherînin. Di nava azadî û serfiraziyê de divê keda me jî hebe. Tiştêkî bêked nîn e.

Yeni Hayat gihîşt 100 hezarî

Romana nivîskarê tirk **Orhan Pamuk** ya ku bi navê **Yeni Hayat (Jina Nû)** derket, di nav du meha de firotina wê gihîşt 100 hezarî. Roman heta vêga 30 carî hatiye çapkirin. **Yeni Hayat** di fuara **TÜYAP**'ê ku di navbera 5-13'ê Sermawezê de çêbû, serê her deqeyekê yek hate firotin. Li Tirkîyeyê kitabekek ewçend zû û pir nehatiye firotin. **Orhan Pamuk**, li Tirkîyeyê jî bilî **Yeni Hayatê** bi kitaba xwe ya bi navê **Kara Kitap (Kitaba Reş)** bêtir hate naskirin. Kitabên wî yên din ev in: **Sessiz Ev (Mala Bêdeng)**, **Beyaz Kale (Keleha Spî)** û **Cevdet Bey ve Oğulları (Cewdet Beg û Lawên xwe)**



Orhan Pamuk

GELEK NEXWEŞÎ VEŞARTÎNE LI VÎ WELATÊ XWEŞ



Qedara 'Bira Qederê'

Mehmed Uzun, nêzî 10 salan e ku li ser vî romanê dixebite. Roman li ser jiyana Celadet Bedirxan hatiye nivisandin. Ev agahî, di gelek rojname û kovaran de derket. Lê, di van rojname û kovaran de, ji bilî agahiyên der barê naveroka romanê de, ji vî romanê beş (qisim) hatin tefrîqakirin. Wek nimûne, di hejmara kovara Nûdemê ya 9'an de beşa yekemîn, di rojnameya Newrozê de ji rûpela 205 heta ya 215'an û di rojnameya Jiyana Nû de ji romanê beşek, li ser jiyana Celadet a salên 1934'an wê di demek nêzik de bê weşandin.

Tiştê ku min aciz dike, hîn roman derneketiye piyasê, beş bi beş hate weşandin. Beşa ku min ji vî romanê xwendine, wek pîneyên kinçekî ne. Li Tirkîyeyê ji aliyê medyaya Tirk ve pesnê romana Orhan Pamuk, Yeni Hayatê (Jîna Nû) pir hate dan. Di nav du mehan de bi tesîra medyayê romanê nêzî 100 hezarî hate firotin. Orhan Pamuk di hevpeyvînekê de ev pesindayîn normal didît. Lê me ne bihîst ku Pamuk berî weşandina romanê beşine di rojnameyan de tefrîqa kir. Gerçî di zemanê Tanzîmata Osmanî de roman dihatin tefrîqakirin. Tefrîqa, ji rûpela yekemîn ve heta dawîya romanê bi awakî peryodîk, ji aliyê xwendevan ve di hate xwendin. Daxwaza min ev e ku bila hurmeta nivîskarên Kurd, ji xwendevanan re hebe. Her çiqas xwendevanên Kurd ecemî bin jî, divê nivîskar li gorî sewiyeya pîvanên hemdemî bi xwendevanan re têkiliya deynin, ne li gorî dewran.

SUUT KILIÇ

Firat Cewerî (aliyê çepê) bi Ordîxanê



Em îro li Stenbolê ne. Em li cih û deverên Stenbolê yên dirokî geriyân. Me gelek deverên xweş dîtîn. Camiya Aya Sofiya û ya Sultan Ahmedê balkêş bûn. Ez bawer im, hê jî gelek cihên Stenbolê yên-xweş hene.

Lê hevalino, li vî welatê xweş, gelek nexweşiyên veşartî hene. Gelek nexweşiyên ku

nemaze piraniya we jê bêhay in, hene. Bi tenê di hundirê salek- du salên dawî de li vî welatê zêdeyî sih nivîskar û rojnamevanên kurdan hatine kuştin. Girtîgehên Tirkîyeyê îro tîji nivîskar û rojnamevanên kurd û tirkan in. Hejmara gundên kurdan ên şewitî û valakirî bi ser du hezaran ketiye. Li vî welatê ku bi me xweş dixuye, nifû-

sa kurdan ne kêmi bîst milyonan e! Ka li vî welatê çiyê kurdan heye? Kurd li vî welatê xwediyê çi ne! Kanî dibistanên kurdan? Kanî televîzyona kurdî? Ka çend rojnameyên Kurdî hene? Salê çend pirtûkên bi kurdî derdikevin?

Ez dizanim, armanca me çarsed nivîskarên ji sih welatên cihê, ku di vî rêwîtiyê

de li hev civiyane dinyayêke rohnî, demokrasîyêke rastî û azadiya fikir û mafê mirovan e.

Lê em niha di hundirê yê gemiya azad de, di sînorê welatekî ku ji azadiyê bêpar e de ne.

Di nava me de delegasyona tirkan jî heye. Di nava delegasyona tirkan de helbestvan Can Yücel jî beşdar e. Can Yücel jî bo bîranîna nivîskar û humanîstê kurd Musa Anter

helbestek nivîsandîye. Bi destûra we be, bi hêviya ku wê rewşenbîrên tirkan riya Beşikçi û Yücel bişopînin, ezê wergêra helbesta 'Ji bo Musa Beg' ya bi Kurdî bixwînim.

* Ev kurtkirina peyvîna Firat Cewerî ye ku di gemiya RENAISSANCE de li pêşberî çarsed nivîskarên ji sih welatên cihê, bi Swêdî û Îngilîzî hatibû kirin.


FIRAT CEWERÎ

Nûbihar

kete sê saliya xwe

Kovara Nûbihar, bi sernavê "Di destpêka sala sêyemîn de" derketê pêşberî xwendevanên xwe. Nûbihar di hejmara xwe ya 25'an de bi giranî cih daye çalakîyên li ser pêşbazîyê, ku di warê "Bikarîna zîmanê kurdî di weşan û hemû aliyên jiyane de çî tesîrê li ser kurdan dike" hatibû tertîbkirin.

Di vî hejmarê de, hevpeyvîn, nivîsên tehlîlî, helbest û werger balê dikîşînin. Zeynelabidîn Zînar bi nivîsa "Rewşenbîr û rewşenbîrî", Nacî Gülmez bi hevpeyvîna di gel Sêx Omer Garîb, Ali Karadenîz bi wergera çiroka Anton Cexov "Kemana Roçild", Sabah Kara ku Berpirsiyarê Giştî yê Kovarê ye, bi wergerên helbestên ji Omer



Xeyam, Mewlana Celaledînê Romî û Baba Tahîrê Uryan ji rûpelên Kovara Nûbiharê re bûne mêvan.

JI BO MUSA BEG

Musa Anter di dema me de
Selahedîne Eyûbiyekî

nû bû

Ger şûrê wî yê hevrêşim dibire
hebe

Yê Musa Beg jî tirkîya wî,
Û ew kurmançiya wî ya xweş hebû
Cihê ku her kes peya diçûyê
Ew bi çimên xwe yên zirav
bi bazdan diçû

Musa Pêxember di nava pêlên derya sor de
gihîştibe peravê

Ew bi biratî, bi biratiya dinyayê re
gihîştiye

Hêstirên ku ji bo Musa Beg dirîjin
Guleyên heftber in

yek bi yek

KELEPOR

Ev der Moskov e

Em niha li paytexta Şoreşa Kewçêrê (Cotmehê) ne; Moskov. Em kurd dibêjin, "Navekî giran, warekî wêran." Me ji dût ve dengê Moskov şêrîn dibihîst, dilê me bi wê re dikeliya, em pê re kêfxweş dibûn. Me nedîtibû, lê ji ber ku kevîrên wê bi xwîne sor bûbûn, me ew wekî xwişka Amedê dihesiband. Mixabin, rojekê tenê jî li xwişka xwe ya dibin destan de nemeyizand. Lê xwedî derneket, lê nepirsî û ji hêstiran çavên wê paqij nekirin. Kurd belengaz bûn, zû baweriya xwe bi nenasan dianîn. Dijmin dost didîtin, dost jî nas nedikirin. Kê kengê bixwesta em dibirin- dianîn, em radikirin- datanîn. Dema ku li Moskov baran dibariya, me li Kurdistanê siwan (şemsi) vedigirt. Lê hema haya Moskovê ji me tune bû. Dîsa jî dilê me pak bû, jê nediqetiya.



DILBIXWÎN

nivîskar û dîrokzanê din. Weke tê zanîn Enstîtuya Rojhelatziyê, yekemîn saziya zanistî ya biyanî ye ku dîroka Kurdistanê bi kurdan daye naskirin.

Xwendevanên wê gelek bûn. Lê mixabin, em niha li xwendevanan rast nayên, gazinên xebatkar û mamosteyên Enstîtuyê gelek in, ji rewşa xwe ne razî ne. Kesek piştgiriya wan nake, dewlet jî êdî bala xwe nade wan. Tevî vê yekê jî, bîr û baweriya wan bi xebatê sar nebûye. Bi taybetî Prof. Hesretyan moral dida mirov.

Problema kurdî, bûye meseleyeke navneteweyî. Hemû dinya li serê disekine. Amerîka jî pêwîst dibîne û li rîya çareserkirina wê digere. Di roja yekemîn de em li ser vê meseleyê ji hemû aliyên ve (siyasî, civakî, çandî, hunerî...) sekinîn. Axaftina min li ser rastiya serokatîyê bû. Di Kurdistanê de rewşa serokatîyê çî bû, niha çî ye? "Serokên" kevn çî ziyar û zirar gihandine neteweya kurd? Serokatiya PKK'ê rîya azadiyê çawa vedike? Min ev pirsên jorîn şîrove kirin. Êdî kesek li Berzaniyan nedigeriya, ev rastiyeke bû di konferansê de. Dîrokzanên ku qedera gelê Kurd tenê bi Êla Berzaniyan ve girê dabûn, niha çavên hemûyan li PKK'ê ne.

Em (Î. Şerîf Wanlî, Doç. Dr. Cebbar Qadir) ji Enstîtuya kurdî- Berlin, hatine Moskovê. Ji Kolna Almanyayê, piştî Konferansa YRWK'ê ya Çaran, yekser me berê xwe da welatê Lenîn. Di 24-25'ê Sermawezê (Mijdarê) de li vî bajarî konferansek li ser meseleya Kurdî hebû. Ev konferans jî aliyê Enstîtuya Berlinê û Enstîtuya Rojhelatziyê ya moskovê ve dihate organîzekirin. Hema hema hemû rojhelatnzanên ku xwe bi dirêjî li ser meseleya kurdî westandine, di konferansê de amade bûn: Hesretyan, Lazarêv, Jîgalîna, Ordîxanê Celîl, Êgorov, Sebonov, Bagirov, Şakirê Xido... û gelek



Costa Gavras (çepê di) wexto ki Yılmaz Güney reydê xelay gênê.


Yew fîlm yew sermiyan

Ina film, 1982'di Festîwalê Filmê Cannes di, film da Yılmaz Güney ("Rayir-Yol")'î reydê xelaya zernên ê girota...

Costa Gavras, 1933 di Yewnanîstan di amewo dîna û Fransa di maneno. O hadîsanê politîkan ser o filman virazeno. Filmê yê wo namedar, Vinîbiyaye (Missing) yew filmdo anasarên o. Nê film 1982 di, Cannes di xelaya zernên girota.

Ina film, 1982'di Festîwalê Filmê Cannes di, film da Yılmaz Güney ("Rayir-Yol")'î reydê xelaya zernên ê girota...

Seki yeno zanayîş, eskeran 1973 di, zor reydi hukim girot xwi dest. Serêkê eskeran, faşîst Pinochet bi. Verê derbî, Allendewo sosyalîst, hukmî ser o yo. Allende yew canmêrdo anasarên bi ki hetanî gan da tîfingê xwi nêrona. Eskerî Turkiya di senêhewa derbe kenî jîni zî eynî ay hewa kerd. Paştey derbekerdoxanê Şîlî di zî Amerîka bî, paştey Kenan Evrenî di zî. Şîlî di hînzaran reyra mêrdimî kişay, Turkiya di zî. Îşkence wey ra zî bi, ewta zî esto. Weyra zî eskerî hema hukim ser o yî, ewta zî. Anasar yew ca di, vinîbiyayan miyan di, yew



MISSING
(Vinîbiyaye)

COSTA-GAVRAS

JACK LEMMON · SISSY SPACEK

lacê Amerîkayîjî zî esto. Lacek, waştada xwi reydi şîyo Şîlî ki bigeyro.

reyra lacê xwi geyreno. De vaji, mêrdeko ti demewo ki lacê xwi geyrenî to çî dî? Semedo ki kê nay bizanî, ganî (ge-

rek o) kê filmî veynî. Wexto ki kê temaşey filmî kenî muy kê benî hezey tellî.

CEMAL PİRANJ

HIN MADEYÊN MUHÎM JI PEYMANA NAVNETEWÊYÎ YA 'NETEWÊYÊN YEKBÛYÎ'

Mafên Zarokan

Kesên ku kamil nebin, zarok têne jimartin. Hemû zarok wekî hev in. Netewe, rengê çerm, cinsiyet, ziman, ol an jî dîtînen cihê; nikarin bibin sedem ku zarok bêne gunehkarkirin (Benda 1-2.)

Parastina zarokan berî hemû karan tê. Ji bo parastinê wan jî, pêwîst e hemû deverên fermî, qanûn û mafên zarokan tim li ber çav bigirin û têxine jiyane (Benda 3.)

Her zarok îê dema ji dayika xwe bibe, xwedî maf e ku navek lê bê danîn û her wisan hemwelatîyê welatekî be û bidê û bav mezin bibe (Benda 7.)

Zarokên ku dê û bavên wan cihê bin, heqê wan heye ku herduyan bibînin, li nik wan bimînin (Benda 9.)

Hewcedariya zarokan heye û qanûnî ye ku bêne hêvotin (terbiyekirin). Mafê dê û bavên heye ku zarokên xwe bispêrin zarokxaneyê, dema pêwîst be ku bi karê xwe ve mijûl bibin (Benda 10.)

Zarokên ku sêwî bin (bêdê an jî bav), an jî, ji dê û bavê xwe hatibê bi dûrxistin, pêwîst e ku li dibistanekê bêne hêvotin, li wan bêne nêrîn û maleke nû ji wan re bê dîtin.

(Benda 20.)

Her zarok xwedî mafê nerîna tenduristiyê (sihetê) ye. Û divê nexweşiya wan bê dermankirin. Zarokên ku li navçeyên hejar bin, divê li wir neyê hiştin ku lê perîşan nebin. Pêwîst e her welatek, li hemberî nexweşiyên zarokan derkevin ku vê gelşê çareser bikin. Jinên ducan û yên xwedî zarokên bipêçek in, mafê wan î lênêrîne heye (Benda 24.)

Her zarok xwediyê wî mafî ye ku li gorî normên cihanê mezin bibe. Ji ber vê yekê pêwîstiya wan bi mal, xwarin, ava paqij û cilan heye. (Benda 27.)

Zarokên qop û şêht, xwediyê mafê lênêrîneke baş in. Her wisa pêwîstiya wan li lênêrîneke taybetî jî heye. Nimûne, dermankirina wan, hêvotina pîralî, pêşxistina wan, di nava civatê peydakirina cihekî baş. (Benda 23.)

Her zarokê penaber, xwediyê mafekî ye ku lê bê nêrîn û parastin. Her wisa mafê wî zarokî/ê, bi qasî mafê zarokê wî welatî ye. Zarokên penaber ku bêmalbat in, pêwîst e ku alîkarî ji wan re bê kirin ku malbata xwe bibînin û li cem wan bi cih bibin (Benda 22.)

Wê bidome



N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Emê li we xwedî derkevin

emê li Welatê Me xwedî derkevin û beriya DGM (Dadgeha Ewlekariya Dewletê)ê bi dest bixin bixwînin.

**Irfan Batmanî
Balikesir**

Roja em li bendê bûn...

Silav rojnameya gelê bindest û belengaz. Bi rastî me pir bêriya rojnameyeke bi zimanê kurdî biribû. Bi alîkariya rojnameya Welat gelek mirov hîni xwendin û nivîsandina zimanê xwe bûbûn. Ez bawer dikim ku, hûnê jî li dû rêça Welat bimeşin û ji bo zimanî kurdî bibin rêber.

Hûn bawer bikin,

Hebûn û mirin li dijî hev in. Pev-re namesin. Gelê Kurd bi saxî miriye. Divê em ji vê tewşitiyê derkevin. An mirîtî an hebûn. Hebûna me di

destê me de ye.

Heke em bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin, emê her hebin. Wekî din mirin e; bêxîretî ye; mirineke lewîfî ye. Ez hêvî dikim ku dengê Welatê Me ji guhên me dernekeve. Xwendevanên kurd li rojnameya xwe ya bi kurdî xwedî derkevin. Xebat û alîkariya xwe bi parastina zimanê xwe werînin cih.

Em sih milyon in!.. Em xwe bidine çî emê bi ser kevin. Xwendevanino, roja em li bendê bûn va ye hat. Îro ye. Gelş, gelşa me Kurdan tevan e.

Mamostayê hêja Nurretîn Zaza beredayî negotiye, "Bi zimanê xwe bixwînin, bidin xwen-

din." Derketina te pîroz be Welatê Me.

**Kemal Selîm
Stenbol**

**Silav li
Welatê Me**

latê Me". Ew ji ewil ve Welatê Me bû. Silav li hemû têkoşer û xebatkarên Welatê Me.

**Ferîdûn Qerejdaxî
IZMİR**

**Bi xêr hatî
roniya çavan**

şûn ve gerek e em lê xwedî derkevin.

**Mazlum Doğan
Kadıköy /Stenbol**

Silav li we

Dewletê, hemû sazîyên kurdan ji xwe re kirin armanc û xwest ku wan îmha bike. Ji vê êrişê, çapemeniya kurd para xwe stand. Lê ew êriş bi şûn ve li xwediyê xwe vedigere. Welat li ser lingan e. Welat bû "We-

Ey Welatê Me, tu bi xêr hatî nava me. Gelî nivîskar û xebatkarên Welatê Me, em hurmeta xwe pêşkêşî we dikim. Derketina rojnameyeke bi Kurdî xizmeteke pir mezin e. Ji iro bi

Gelî xebatkarên Welatê me, em li we û hemû dostên ku keda wan ketiye vê xebatê silav dikin. Em roja 27'ê Sermawezê li gelê xwe pîroz dikin û di jiyana we ya weşanê de ji daxwaza xebatên serketî dikin.

**Dilên PKK'î
Girtîgeha Bucayê**

Derketina rojnameya Welatê Me hîna di heftiya sêyemîn de gelek deng da. Her roj bi dehan telefon û name ji me re tèn. Kesên girîngiya rojnameyê xwerû bi kurdî dizanin kêfxweşiya xwe tînin ziman, pêşniyar û rexneyên xwe ji me re dişînin.

Ji Kurdistan, Tirkiyeyê û welatên din hîna ji vê gavê ve yên rojnameya me dinasin, bi çavê weşaneke neteweyî lê dinêrin. Daxwaza gişan ew e ku demek ji ya din zûtir Welatê Me xwe bigihîne nav hemû kurdan û bibe dengê gelê kurd. Em baş fêmdikin ku heta îro nebûna weşaneke neteweyî kêmasiyeke bingehîn e ji bo kurdan.

Hebûna rêxistin, partî, sazî û faalîyetên siyasî yên cihêreng pir normal û xwezahî tèn dîtin, bes li aliyê din tunebûna saziyên neteweyî jî



JI WELATÊ ME

Mazhar GÜNBAT

Welatê Me û neteweyîbûn

wekî sebebê ji hev belavbûnê û dûrketinê xwe nîşan dide.

Heta îro kurdan di warên cur bi cur de gelek tişt kirine. Her çeşit têkoşîn û çalakî ceribandine. Ne birêûpêk be jî, heta niha bi sedan weşanên kurdî li çar aliyên Kurdistanê û li welatên din bi dizî an jî eşkere derketine. Mixabin, kes nikare îdîa bike ku wan weşaneke bi temami neteweyî û berfireh derxistîye. Dema em vê rewşê li

ber çav digirin, îdfaya derxistina weşaneke neteweyî pir mezin xuya dike. Em di wê zanebûnê de ne jî. Tevî vê yekê em vê îdfayê ji bo rojnameya Welatê Me rast û li cih û pêwîst dibînin, ji bo pêkanîna netewebûyîne emê bixebitin. Qet nebe ji hemû weşanên derketine û dertên, emê neteweyîtir bin. Wê berê me, dîtina me fireh û doza me mezin be. Ji xeynî xain û veqetînxwaz û kesên bi hesabên biçûk ve eleqedar

in, Welatê Me wê bibe rojnameya hemû kurdên welatparêz, şoreşger û demokrat. Emê giş di netewebûyîne de destê xwe bidin hev û vê doza mezin bimeşînin. Gelo netewebûyîne çî ye? Gerek e çewt neyê fêmkirin û her kes vê mefhumê bi aliyekî cihê ve nekşîne, naveroka wê neyê tehrîfkirin. Neteweyîbûn ku bi çend gotinan bê tarîfkirin; di her warî de parastin, hezkirin û xwedîderketina li hêjahiyên gelê kurd e. Neteweyîbûn, ji bo ji nû ve bidestxistina mafên gelê kurd dozajotin e. Neteweyîbûn, xwedîkirin û pêşvebirina ziman, wêje, şîr, rojname; evîna niştiman, vegera li welêt û jiyandina nîrx û hêjahiyên gel û rûmeta mirovî ye. Di çarçova netewebûyîne de emê bi nivîseke din li ser a nîrx û hêjahiyên bisekinin.

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

We tevan pîroz dikim

min û bi hesreta xwendina zimanê xwe bûn.

Hinek gotinên min ji we re hene. Hêvî dikim ku hûn dilê xwe ji min negirin:

1-Li gorî zanîna min navê vê mehê ne "sermawez" e, "mijdar" e

2-Girîng e ku hûn derheqê qewmînen ku li çar aliyê welêt dibin me agahdar bikin

3-Rûpelek tenê bi hevpeyvînen bi dayikên şehîden şoreşê re biweşî-

nin
4-Di hinek nivîsaran de xebirdanên (peyvên) bi Tirkî derbas dibin. Wek minak:

"Ez dîsa 'tekrar' dikim mirov dikare xwe kurd, ereb, laz boşnak an jî koçber 'hîs' bike."

Ez hêvîdar im ku di pêşveçûn û bilindbûna rojnameyê de ev kêmasî dê ji holê bêne rakirin. Ji we tevan re silamê û pêşketinê daxwaz dikim.

Ziver Özkaş

We tevan pîroz dikim

Em bi derketina rojnameya Welatê Me kêfxweş bûn. Em hêvîdar in ku rojname jiyana xwe ya çapemeniyê bi awayekî azad, serbest û bêastengî bidomîne. Ji aliyê din ve astengî, tehdît, binçavkirin û cezayên ku dewlet li ser çapemeniya kurdî pêk tîne protesto dikin.

Bi navê kafleyek welatparêzên kurd li Sofiyayê

S.S. Dilpolo

Kêş û pîvanên me

Qratak: 7 kilogram e
Timinek: 28 kg. nîsk, 26 kg. genim, 24 kg. nok, 22 kg. ceh e
8 timin: Kêlek e
Kêlek: 224 kg. nîsk, 208 kg. genim, 192 kg. nok, 176 kg. ceh e
Nîşe: Timin (elb) ji bo dexl û dan tê pîvan.

Ji pîvanan:
Gazek: 70 cm (santîmetre) ye
Bihostek: 25 cm ye
Qonaxek: 12 seat e (bi çûyina bi piyan)
Latek xak (erd): 1000 metre çarçik e (donimek e)

serbiser:
Tenekeyek: Dibe 5 fitre
Tenekeyek: Dibe 2 kod û 2 fitre
2 fitre: Kodek e
2 teneke: Elbek (timin) e
Sefik nan: 4 nan

Rêber Ronî

Di nava gelê me de hin pîvan û kêş hene. Dibe ku gelek kes ji me bi maneya wan nizanibe û bi tenê navê wan bihistibe. Li jêrê ezê hin kêş û pîvanan bi rêûzê bikim.
Ji kêşan:
Weqî: 400 gram e.
Du weqî û nîv: Kilogramek e (kg)
9 weqî: Minek e.
Minek: 3 kilo û 600 gram e
Lître: 8 kilogram e
2 min 2 weqî: Lîtreyek e

Xebatkarê Rojnameya Me Samî û Selma zewicîn.

Di jiyana wan a nû de em hêviya rûmet û serkeftinê dikin.

Xebatkarên Welatê Me

Ez bi derketina rojnameyê bi kurdî pir kêfxweş û dilşabûm. Bawer dikim ku xortên Kurd tev mîna

WELATÊ ME

Êdi were
Welatê Me
Tu bide min hewa
Li zozanên Serhedan
Gelîyê Laleş
Şingal û zinarên
Mêrdîne
Da em rabin
Ji xewa hezar salan

Were Welatê Me
Emê herî tewafa
Ehmedê Xanî
Meleyê Cizirî
Û koma ronekbrên me
Da em wan bi bir binin
Piştî sed salan

Bi xêr were
Welatê Me
Min bigerîne
Li şkeft û nawîsên
Cûdî, Gabar û Sîpanê
Û ya Melezgirê
Tevî refên hevalan

Were
Bi xêr were Welatê Me
Bibe çav û gav
Rê nîşani me bide
Da em li şûna
Warên şawitî

Êdi were
Welatê Me
Min hilgêre ser pişt
Bozê Rewan
Birexşê Belek
Û Bilêcana Kalik
Da bi welat bigihim
Welatê bi kulên giran
Êdi were

Biçînin
Gul û beybûnan
Nergîz, şîlan û berfînan
Em bixemilînin
Deşt û berî
Zinar û daristanan

Jir Dilovan

Dengekî xweş û qîrîneke sê oktav

Cara pêşîn di sala 1985'an de kasetek bi tirkî dadigire. Pişt re dev ji "bi Tirkî strandinê" berdide. Vê yekê wiha vedigote me: "Elhemdülillah, dayîka min jî li wê kasetê guhdarî nekir. Min dêhna xwe dayê ku ev ne îşê min e. Min dev jê berda û min êdî bi tirkî kaset danegirtin."

Ganî Nar, di sala 1959'an de li bajarê Wanê tê dinyayê. Dibistana Seretayî (mekteba pêşîn) heta sala çaran dixwîne û ji derve ve diqedîne. Li ser devê wî, ji şivantî û gavantî heta bi karên inşaaan, di gelek waran de dixebite.

Li ser gotinên heval û derdorên xwe ku jê re dibêjin, "Dengê te xweş e" dest bi stranbêjiyê dike. Ev rewş li dibistanê, cara pêşîn bi zarê Tirkî diqewime. Heta xwe hînî lédana tenbûrê kiriye, ji deh heban zêdetir, tenbûr di dest de "behecîne."


Di warê muzîkê de tu hêvotinek (talîmek) nedîtiye. Ne li ser xebitandina deng, ne li ser bikaranîna amûrên (enstrûmanên) muzîkê xebateke wî ya akademîk çêbûye. Lê em agahdar kirin ku ji çend salan zêdetir e, li Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM), li Stenbolê vî karî li gorî derfetên (îmkanên) xwe bi awayekî zanistî (ilmî) dîkin.

Vegerîna li rastiya xwe

Cara pêşîn di sala 1985'an de kasetek bi tirkî dadigire. Pişt re dev ji "bi tirkî strandinê" berdide. Vê yekê wiha vedigote me: "Elhemdülillah, dayîka min jî li wê kasetê guhdarî nekir. Min dêhna xwe dayê ku ev ne îşê min e. Min dev jê berda û min êdî bi tirkî kaset danegirtin."

Ji bilî wê kasetê, sê heb jî bi kurdî dagirtine. Jiyan, Welat û Misto navên wan in. Bêhtir ji "jiyan"ê hez dike. Gava li Almanyayê kasetaxwe "Welat" derdixe, li ser zimanan gotina, "Burhan Çaçan bi Kurdî kaset dagirtiye" digere. Niha ji bo derxistina kasetê li ser repertuwarekê dixebite.

Hunermend, xebatên xwe



ji demeke dirêj ve ye li NÇM'ê didomîne. Ji berê ve bi siyasetê re eleqedar e. Di nava partiyên çepgir ên tirkan de jî cih standiye. Me xwest pirtir pê re li ser hunerê, muzîkê biaxivin. Me jê pirsî û wî jî bersivand. Em bi tenê bersivên wî bi şeweyekê kurt pêşkêş dikin.

Ji stranê bilind û fireh hez dikim

* Ev e şêş sal e ku ez bi awayekî profesyonel li ser dagirtina kasetan, studyoyan, arenjeyan dixebitim. Jiyan min a muzîkê ji 15 salan dibihure.

* Diaframa min pir saxlem e. Ez zehf caran li serê sekinim. Min ji mamosteyan jî pirsî. Gava tu bistrî û dengê

te tîrî neke, tu deng bi-avêjî qaf çawa dibe. Stran çiqas fireh be, çiqas bilind be ez ew-
qas jê hez dikim.

* Rojek em bi hevalan re rûniştibûn. Wan lê didan û min digot. Dixwestin dengê min biceribînin. Nasir Reza-zî, Dilovan, Hesen Lûr, Peywan û çend hevalên din bûn. Heta sê oktavan ez derketim.

* Dengê Şivan jî, dengê İbrahim Tatlıses jî sê oktav e. Dixwazim li ser vê yekê bisekinim. Tu zanî sê oktav tê çî maneyê? Di destê herkesî de tivingeke qirme hebe û di destê te de jî roket (mûşek) hebe. Mirov gerek e wê baş biemilîne (bi kar bîne) û qîmeta wê bizanibe. A muhîm ev e, wê çawa biemilîne, çawa wî dengî li neyarê xwe bide û bi çî awayî bi kerî mi-

letê xwe bîne. Wexta ne wisa be, dengê me bibe çar oktav jî xêra wî tune.

Muzîkê divê ji bo gel be

* Kesê muzîkê jî bo gelê xwe, miletê xwe, ji bo insanê xwe çêke, keda wan heja ye. Bila kes li min negire, gotinê min li ser muzîkê ne, li ser qanûnên wê ne.

Koma Çiya, bi rasû di dema xwe de, di nava NÇM'ê de, di zemanekî teng de cewaba zehf tiştî daye. Wan li ser muzîka Kurdî ya otantik xebatên baş kirine. Xanemîr, li ser qaydeyên dengbêjkî rabûye. Koma Amed, li ser modernkirina muzîka Kurdî di-sekine. Lê ew hê di gerê de ne.

* Hunerkom ev dozdeh sal e ku di warê kultur û muzîkê de xizmeteke baş ji gel re kiriye. Ez nikarim bi awayekî mutleq bibêjim ku Hunerkom muzîkeke "arabesk" çêdike. Belê kêmasiyên wê hene. Lê muzîka wan, tam ne

Kurdî ye jî.

* Gava tu notayên stranekî deynî ber insanekî tirk, bila kes nekişîne ser şexsiyeta xwe, wê li gorî xwe lê bide. Ji ber ku bi ruhê kurdî nizane. Muzîka kurdî, mizraba we, xencereya we, qaydeyên wê yên cihê hene. Niha ev bêşansiya me heye. Kêmasiya me ev e. Ji bo Hunerkomê jî, ji bo NÇM'ê ev rewş heye.

* Kesên ku ji bo miletê xwe muzîkê çêdike, dengê wan çawa dibe bila bibê, hêjan e û wekî çiçek in. Lê di nava wan de gulek heye ez jê zehf hez dikim. Rehmetiyê Mihemed Şexo.

* Di nav kesên sax de, Hesen Lûr, Şêrûz, Comerd, Xelil Xemgîn û çend hevalên din hene ku ez bi hezkirinê li wan guhdarî dikim.

* Kî ji bo vî miletî devê xwe vekê, bibêje "Ey milet hay ji rastiye be", ew taça serê min e.

ZANA FARQÎN